Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1330 | 3-Berfanbar-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Armanca Zîn Elî belavkirina çanda gula ye

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Gulfiroşa bi navê Zîn Elî diyar kir ku hezkirina wê ji gulan re hişt ku ew berê xwe bide vî karî û wiha got: "Armanca min ji vî karî ew e ku çanda gulan li bajar belav bibe."**

Zîn Elî di 16'ê Mijdara sala 1999'an de li bajarê Qamişlo ji dayîk bûye heya 3 saliya xwe li Qamişlo derbas kiriye, paşê ew û malbata xwe berê xwe dan Paytexta Şamê û li wir bi cih bûn heya destpêka Şoreşa Rojava berê xwe dan bajarê Dêrikê û jiyana xwe li wir berdewam kirin. Dema Zanîngeha Rojava vebû Zîn Elî berê xwe de zanîngehê û 2 salan Peymangeha Zimanê Kurdî xwend û 2 salan mamostetî kir. Ji ber ku xwesteka xwendinê li cem wê gelekî hebû careke din berê xwe da Zanîngeha Rojava û 4 salan wêjeya kurdî xwend û niha jî cihekî taybet ji bo xwe vekiriye û gulan difroşe.

Di derbarê kar û hezkirina wê ji gulan re Gulfiroşa bi navê Zîn Elî ji Rojnameya me re axivî.






**Şert û mercên civakî rê li pêşiya pêşketinan digre**

Zîn Elî da zanîn ku piştî derçûna wê ji zanîngehê wê di gelek cihan de kar kir û wiha got: "Tevî ku min gelek karên wêjeyî jî kirin lê min hertim ew hest jiyan dikir ku ne li gor minin, lewma hertim ez di lêgerînê de bûm ku ez karekî layîqî kesayeta xwe bibînim. Berî ku ez zanîngehê bidawî bikim bi salekî min pirojeya gulan danî pêşiya xwe, di pilana min de bû ku ez li bajarê Qamişlo vê pirojeyê dest pê bikim û bi rengekî berfireh, him şitilgeh him jî cihê firotina gulan. Lê di çanda me de nabe ku jinek piştî qedandina xwendinê bi tena xwe jiyan bike û serbixwe be, lewma ji ber şert û mercên civakî malbatê rê li pêşiya min girt ku ez pirojeya xwe li Qamişlo pêk pêkbînim. Êdî ez vegeriyam bajarê Dêrikê li ser min gelek zehmet bû ku ez dev ji hertiştî berdem, ji ber vê yekê nêzî salekî ez rastî nexweşiyan hatim û min nikarî tu karan bikim. Êdî careke din min biryar da ku ez pirojeya xwe ya gulan bi awayekî din pêk bînim, tevî ku di jiyana min de tu kesî ne gul diyarî min kiribûn û ne min diyarî tu kesî kirbû."

**Îradeya jinê rê li pêşiya zehmetiyan digre**

Zîn Elî axaftina xwe wiha domand û got: "Ez xwediya vê pirojeyê bûm û min bixwe destek da xwe, dema min dest bi pirojeya xwe kir êdî malbat û hevalên min yên nêzîk piştgiriya min kirin. Ev nêzî 4 mehaye ku min firoşgeha gulan vekiriye, helbet destpêka her gav avêtinkî zehmetiyên wê hebûn bi taybet di welatê me de heya ku qebûl bikin jin jî dikare herkarî bike. Di heman demê de min bi tena xwe amadekarî ji bo vê cihî kir çi di milê boyax kirin, dîkor û sererastkirin de. Dest pêkê min tenê baqên gulan çêdikirin lê gelek kesan daxwaz dikirin ku ez cihekî koşata vekim ji ber jin bêtir rehetiya xwe di milê van tiştan de bibîne, ji ber vê yekê ez amadekariya dikim ku cihekî din vekim him koşat, karê destan û mûmên destan jî wê têde werin pêşkêş kirin. Di heman demê de ez amadekariyên xwe dikim ku ez tevlî pêşengeha Pamêla bibim da ku karê xwe pêşkêş bikim, ku çawa dema jinek xwesteka wê hebê wê gelek serkeftinan bidest bixwe."

**Belavkirina çanda gulan**

Gulfiroşa bi navê Zîn Elî dawî li axaftinên xwe anîn û wiha got: "Bajarekî wek bajarê Dêrikê cihekî taybet bi gulan nîne, lewma armanca min ji vê pirojeyê ew e ku ez çanda gulan belav bikim tevî ku bajarê Dêrikê navdare bixwezaya xwe lê çanda dayîna gulan têde nîne. Ez gulan ji Şam, Başûrê Kurdistanê û ji Qamişlo tînim, ji ber ku gul ne li cem me tê çêkirin buhayê wê girane lê ji derdorê arzantire, di heman demê de ji ber ku bajarê me fêrî çanda gulan nebûye lewma bi çavekî buha lê dinêre. Tişta ku gelekî min têşîne gelek kes hene biçavekî piçûk li gulê dinêrin û wê bê nirx dibînin, nizanin ku her rengek xwedî wateyekî ye. Armanca min ne madiye yek armanc tenê heya ew jî hezkirina gel ji gulan re çêbibe û çanda gulan belav bibe."

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ez ji darekê ketim:**
- Ez mam ecêbmayî; ez venehirîm.

**Guhên dîkan li min çêbûn:**
- Ez mam ecêbmayî.

**Mûyên mirov radibin:**
- Mirov dimîne ecêbmayî; kelecan mirov digire.

**Mûyên mirov zîq dibin:**
- Bi heman wateyê.

**Mûyên serê min bûn sîx:**
- Ez pir mam ecêbmayî.

**Mûyên serê min zîq bûn.**
- Bi heman wateyê.

**Stirhên serê min hatin:**
- Ez mam ecêbmayî; li min pir xerîb hat.

**Tiştên nedîtî nebînandî/ tiştên nemayî:**
- Tiştên ti kesî nedîtîn; tiştên ecêb.

**Tu dibêjî qey hêstirê zaye:**
- Pir maye ecêbmayî.

**Xwîn lê miçiqî:**
- Ma ecêbmayî; venehirî.

**Ya ku me nedîtibû me dît:**
- Tiştên ecêb û sosret hatin serê me.

**LI SER DAXWAZIYÊ**

**Barê me giran kir:**
- Pir ji me xwest; pir tişt ji me xwestin.

**-Bavê bûkê qelenekî pir ji me xwest, barê me giran kir.**

-Xwediyê kar karê deh kesî da me sê kesî; barê me pir giran kir.

**Bila serî hebin kum pir in:**

**- Pirbûna mêran tê xwestin.**

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan
Ya Diyar Bohtî

## Kulmek Şerab

**Cîger Efrîn**

Ji lêvan da min gulmek şerab
Xelas kirim j' payîn -îzdirab
Pir zû ji min dizîn dîlbercan
Ez û ew mane bê ax-turab

Bi hêvî çûme gulistanê
Da ku li wir bibînim Xan ê
Neyaran wêrankiribûn bax
Bi tenê nalîn mabû j' can ê

Agirê evînê reng kesk e
Dicebirîne dil û bask e
Ha xemsarên eşqê ha mirî
B' çavên evînê kesan naske

Min ji xwedê xwest şahîya dil
Wî rabû da min êş, derd û kul
Reb'ê nizane çi ye daxwaz
Çima limêj kim b' êş û bê dil

Mazda, Reb bihêle bê miraz
Şerûdan bihêle bêkiras
Mehrûm neke bengîyan j' tînroj
Aşiqan dûrxe ji xêrnexaz

Ez ê baxsitanê hişînkim
Dîlbercanê tê de bi cihkim
Kenê dîlberan coşa dil e
Helbestê bikim fîstan-lêkim


Bi Kamîreya Ronahi Sadûn

## Ji pêlên koçberiya duyemîn, du çîrokên ji hezarên çîrokên şibyayî



Bi hezaran çîrokên venegotî yên ku îfadeya hêz, biryardarî û êşên jinan dikin ku gotin û hêstir têrkeriya wê nadin, hene. Ev du çîrokên ku hûn ê bixwînin, vegotina perçeyek ji êşkişîna 48 demijmêrên ber bi rêwîtiyeke ne diyar ve ne. **R-2**

## Hevserokê KNK'ê: Li hemberî geşedanan hevrêziya Kurdî qels dimîne



Hevserokê KNK'ê Ehmet Karamus da zanîn ku li Rojhilata Navîn guhertinên bi lez çêdibin, çendî hewldanên yekrêziyê baştir bin ji demên berê jî, lê dîsa qels dimîne li hemberî geşedanên siyasî...**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1330 | 3-Berfanbar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Yekîtiya Esnafan pira di navbera welatî û rêveberiyê de ye



Hevserokê Yekîtiya Esnafan Nizhan Mehmûd diyar kir ku armanca wan ew e yekîtî bibe pireke di navbera rêveberiyê û welatiyan de...**R-8**

## Di mîtolojiya û ol de civak



Mîtolojî şaxek ji zanistên mirovî ye ku şîrovekirina efsane û çîrokên gelêrî yên li ser xwedayan, qehremanan û bûyerên serxwezayî di çandên cûda de lêkolîn dike.**R-7**

## Ji Çiraxên Wêjeya Kurdî

Ji çavkaniyên çîrokên gelêrî û sirûdên jinan ên li qiraxên çeman, heya dengê cotkaran û bêhna nanê tenûrê, Eyşe helbestên xwe wek efsaneyan vehûnandin û dengê jinê bilind kir.**R-9**

# HESEN KOÇER:NENAVENDÎBÛN ÇARESERIYE NE PARÇEBÛN E





**Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Cîbcîkar a Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hesen Koçer diyar kir ku eger li Sûriyê li şûna navendîbûnê, nenavendîbûn pêş bikeve wê gelek pirsgirêkan bi xwe re çareser bike. Li cîhanê sîstemên nenavendî bihêzin û siyaseta wan xurt e, pêwîstiya Sûriyê jî bi vê sîstemê heye.**

## 'Di hevsengiya Sûriyê de hemû alî dixwazin giraniya xwe çêkin'



Rojnamevan Mansur Adali diyar kir ku hîn di pêla destpêkê ya serhildanên demokratîk ên gelên Sûriyê de rejîma Baas têk çûbû, lê ji aliyê hin hêzan ve li ser piyan hatibû hiştin, gel jî li bendê bû ku li şûna wê rejîmek demokratîk a ku maf û îrada siyasî nas bike, were avakirin...**R-5**

## Ji navdêrên jinên Kurd; Adîle Xatûn



Ew jina navdar sala 1895'an li gel kesekî naskirî yê devera Helebcê yê bi navê "Osman" dizewice. Piştî mirina Mehmûd Paşayê Caf serokayetiya eşîra Cafan dikeve stûyê Osman Paşayê Caf û Adîle Xanim jî dibe hevkara hevjînê xwe...**R-10**

**Cilûbergên pirrengî eyb tê dîtin!**
Nehîr pale — R-2

**Tirkiyê leyîstina rola xirabker didomîne**
Zekî Bedran — R-4

**Li Ber Deriyê Sedsala Nû: Aştî an Kaos?**
Erdogan Altan — R-5



**Pêşketina Îsraîlê di Sûriyê de bi peyam e!**
Dilyar Cizîrî — R-6

# Ji pêlên koçberiya duyemîn, du çîrokên ji hezarên çîrokên şibyayî

Bi hezaran çîrokên venegotî yên ku îfadeya hêz, biryardarî û êşên jinan dikin ku gotin û hêstir têrkeriya wê nadin, hene. Ev du çîrokên ku hûn ê bixwînin, vegotina perçeyek ji êşkişîna 48 demijmêrên ber bi rêwîtiyeke ne diyar ve ne.

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Di 1'ê Kanûna 2024'an de gurên hov yên ku ava xwînvexwarinê ji devê wan diherikî li derdor herêma Şehbayê û Tilrifetê çembera xwe girêdan. Bi zimanekî zelal.. li derdor gelê Kurd, gelê Efrîn û Şehbayê girêdan. Yê ku filitîn jiyaneke nû bi dest xist û yê ku dest wan ket jî bi serbilindiya xwe ya bi qasî çiyayê Kurmînc jiyana xwe oxirî welêt kir ku rêwîtiyan wan a piştî 7 salan ji koçberiyê, li wir diqediya. Gelê ku beriya salekê pêla koçberiya duyemîn ji Şehbayê ber bi herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve meşiya ye; Jinên Efrînê di vegotina şahidî, êş û hêza xwe ya biryardariyê piştî 7 salan ji berxwedan û avakirina jiyaneke nû li Şehbayê, çîrokên xwe yên du rojan ji me re vegotin. Di vê raporê de guhdarkirina bi hezaran ji çîrokên şibyayî, Rojnameya me bû duhdarvanê du çîrokên jinên ku ji roja biryara derketina ji herêma Şehbayê ber bi Reqa û Tebqa ve bû.

### Serpêhatiya Guney di roja veqetîna ji bîranînên 7 salan

Guney Mistefa 47 salî, dayîka sê zarokan 2 keç Zîlan û Viyan û yek xurtî ye navê wî jî Mihemed e. Zîlan li peymangeha Hunerê ya Bilind a Hîlala Zêrîn û Mihemed jî li Zanîngeha El-Şerq ya Reqayê dixwînin. Guney Ji Gundê Ereba ya navçeya Mabata ye. Xebatê Hîlala Zêrîn dike, hevjînê wê jî di xebatê perwerdehiyê yê Hêzên Ewlekariya Hundirên de kar dike. Guney dema li Şehbayê tev Viyan û hevjînê wê Mihemed Elî ve di xaniyekî li bajarokê Ehdas de tevî malbateke din ku ew jî mirovê wan in jiyan dikrin. Dema ku biryara jinişkêva ya derketina ji herêma Şehabyê û valakirina wê hat standin ew jî tevî malbata xwe ku li malê jiyana xwe ya weke her roj jiyan dikirin, haya wan ji derketinê nîn bû. Ev yek ne tenê malbata Guney dispêre. Di heman demê de tu kesî ne rêveberî û ne jî gel texmîn nedikirin wê bi vê lezbûnê dengeyên leşkerî di Sûriyê de bên guhertin û HTŞ'ê serweriya xwe li ser hemû parêzgehên Sûriyê bike. Di Roja 1'ê heyva Kanûnê de Guney, hevjînê xwe û keça xwe Viyan wê rojê li mal in. Di serê sibê de weke ku em jî bibûn şahid tu tevgerekî ku ev çete berê xwe bidin herêma Şehbayê nîn bû. Berûvajî wê şervanên me derbeyên herî giran li wan didan û herêm di pozisyona parastinê de bû. Her wiha di wê rojê de merasîma Şehîdekî jî hebû.

Bi saetên nîvroj re êdî li derdora herêmê tevgera çeteyan çê bû û dengê mermiyan zêde bû. dema wisa dibe hevjînê wê derdikeve gel hevalan. Guney dibêje ku weke her roj wa jiyana xwe ya normal jiyan dikir,



**Guney Mistefa**

xwarina xwe ya rojê amade dikir û tu amadekariyên derketinê nekiribû. Di wê hingê de dengê şer gur dibe, ji ber ku Ehdas deryaya destpêkê ya herêmê bû pevçûna herî mezin di wir de çê bû. Keça wê ya li Hesekê telefon dike û dibêje "Yadê hûn li ku ne, ew dibêje em li mal in. Zîlan vedigerîne û dibêje yadê çete êdî di nav Ehdas de belav dibin". Dema wisa dibhîze Guney derdikeve derve û dibîne ku hemû cîran û malbatên taxê derdikevin, tenê malbatek maye ew jî tiştên xwe li siwariya xwe bar dikin. Ew malbat dibêje were em te û keça te bi xwe re derxînin, Guney vedigerîne dibêje ez vê kalmêrê nexweş û hevjîna wî li pey xwe nahîlim. Cîranê wan her tiştê xwe ji siwariyê derdixe û hemûyan bi malbata xwe re derdixîne.

Heyanî wê demê deng ji hevjînê Guneyê nîne, êvar konê xwe vedigre, kerwan bi hev dikevin. Ji aliyê Ehdas, Babinês û li aliyê Kampa Serdem sê kerwanên koçberan tên çêkirin. Di nava wê êvara yekê mehê heyanê duyê mehê çi çîrok û serpêhatiyên ku nayên vegotin diqewimin. Çeteyên hov weke guran li derdora wan kerwanan digerin û diftilin ku li bendê ne wê kengî êriş bikin.

Guney bi vî awayî çîroka xwe didomîne. Bi sibehê re şervanek qîr dike û ber bi wan ve tê, laşê wî di nava xwînê de maye, tê û xwe diavêje erdê cilên xwe yên leşkerî ji tirsa ji wan bê namûsan ku wî bibînin ji xwe kirine, cilên tenik yên ku li ber wê sermayê nabin germahî li xwe hêştine. Ew şervan ku ji grûpekî hevalan tenê ew sax ma bû û xwe li eraziyan xistiye heyanî gihîştiye kerwanan. Dema Guney ber wî ve diçe xwe diavêje hembêza wê û digrî. Guney bi gelê derdor xwe re cilan jê re peyda dikin, lê şervan dibêje "Ka ez ê çawa derkevim tiştek min re nîne" Guney li cihekî di siwariyên kerwanê de sekinîne digrere, lê mixabin nîn e. Ew Terektorekî ku sîtila wê pêve ye dibîne. Ji şervan dixwaze ku dema kerwan bi rê ket, tu xwe pêv bigre. Şervan ji kêfara digrî û wisa lihevdikin.

Guney dibêje ku dema derketina gel, her çend mitreyan çeteyek hov bi qilêşa xwe sekinîbûn. Hewil didan ku gel bitirsînin, li pêşiya gel ew ajal û dewarê ku gel dixwest bi xwe re derxînin dikuştin. Çêlekek ducanî bi qilêşên xwe bi ser ketin û ew kuştin, ev yek jî nimûnek ji hezaran e. Li ser rê çeteyek siwariya wan disekinîne, ew xityarê nexweş li pêşiya siwariyê kirine ku kîjan deqê wê jiyana xwe jidest bide ne diyar e. Çete dibînin ku Viyan serê xwe negirtiye, jê dipirsin, Te çima porê xwe negirtiye? Viyan ji hêrsa re gotinekê nake û weke dînan bi borê xwe digre û derdixe ser çavên xwe. Guney ji tirsa re dibêje "Keça min dîn e, nexweşe ji bo bo xwedê tiştekî nekin, bihêlin em derbas bibin ev kalemêr wê di destê me de bemire". Û wisa derdikevin.



**Fatme Hesen**

Piştî derbasbûna zêdetirî deh demijmêran dighînin Tepqa yê. Ne ew dizanin hevjînê wê sax e û ne Mihemed Elî dizane ku malbata wî derketiye. Telefon bê enerjî ne, gel û siwariyên koçberan li bin guhê hev dikevin. Di wê tarîtiyê û qelebalixiyê de ku kerwan bi êvarê hêdî hêdî digihîştin Tepqayê. Viyan qîr dike û dibêje Bavooo… Mihemd Elî wan dibîne; gotin ji devê her sêyan dernakeve, tenê bi hembêzkirinê êş û kêfxweşiya xwe vedibêjin.

Niha malbata Guneyê piştî rêwîtî û li gelek bajar û cihan ji Tebqa, Reqa, Hesekê û Dêrikê diguherînin, herî dawî niha li bajarê Qamişlo jiyaneke nû bi hêviya vegerê dihunin.

### Serpêhatiya derketinê ya Fatme Hesen

Fatme Hesen 43 salî ew jî ji navçeya Mabata ya Efrînê ye, dayîka çar zaroka ye 2 keçik û du xurt. Lawê wê yê mezin Ehmed di nava hêzên Komandosê de ji dema Şehbayê de cih digre, keça wê jî li zanîngeha Rojava dixwîne û her du yên biçûk jîl i dibistanê dixwînin. Fatma li Gundê Til Qireh a Şehbayê tevî malbata xwe diman. Di roja biryar derketinê de wan jî jiyaneke li gor êriş û geşedanên her roj diqewimîn rojên xwe derbas dikirin.

Fatma di ravekirina çîroka xwe û ya malbata xwe de wiha dide pey hev. Piştî saetên nîv roj êdî ku şer gur dibe û gel dikeve nava tevgerê de Fatma û malbata xwe tiştekî nakin. Malbatên derdora wan amadekariyên xwe dikin lê Fatma dibêje "Lawê min Ehemd li eniya Şer e, ez dev ji vir û lawê xwe bernadim heyanî ka wê vegere malê yan na". Fatma dibêje ku di wê rojê de pere qet bi wan re nîn bû, xizmekî wan li ewropayê hinek pere ji wan re dişîne, di wê rewşa lihevketî de hevjînê wê diçe navçeya Fêfînê û pereyan tîne. Siwariyeke wan heye Texi ye, hevjînê wê li ser kar dikir ku pê debara xwe dikirn. Hevjînê wê bi wan pereyan diçe weke tedbîr Benzînê dikire, da ku dema lawê wan Ehmed hat pê derkevin. Ji ber ne diyare ka wê kude biçin, wan pereyan jî wisa xerc dikin. Heya wê demê şer gur dibe û gel êdî xwe kom hev dikin, xizmên wan ji fatma re dibêjin werin em ji mal derkevin û herin nava kerwanê. Fatma bi lawê xwe re bi zorê şebeka telefonê peyda dike û diaxive jê re dibêje "Tu nayê, were em ê derkevin bi hev re" lawê wê wiha lê vedigerîne "Yadê tu çi dibêjî, yanî ez xiyanetê bikim!! Herin hûn herin lê ez hevalên xwe bernadim" Ew hemû li nîvê malê de rûdinin û digîn. Xizmekî wê heye dibêje "Ez jî bi Fatma re dernakevim, heyanî ku Ehmed neyê em kesek dernakevin". Piştî demijmêrek derbas dibe Ehemd telefon dike ku dibêje ew tê bila benda wî bisekirin. Saet çaran piştî ku çete dikevin nava bajarokê Til Rifetê şervan vedigerin paş de û Ehemd bi mîtorekê ji yên hemwelatiyan xwe digîne malbatê.

Piştî derbasbûna şevekê li ser kerwanan re, dibe sibe û di saet dehan de êdî biryara derketina yekemîn kerwanê gel ji Şehbayê tê dayîn. Bi rêketinê re siwariya mirovê wan xira dibe, bûka wê malbatê jî ku li ser zayîna keça wê re 12 roj derbas bibûn û bi emeliyat bû di wê sermayê de bi wan re ye. Fatme xwesû, bûk û keça biçûk dike siwariya xwe û xurt jî bi meş derdikevin. Li pey wê siwariya wan jî xira dibe, bê çaretî kona xwe li her du malbatan vedigre. Pereyên bi wan re jî kiribûn benzînê ku mecbûr man siwariya xwe li pey xwe bihêlin. Li ser rê çeteyek bangî hevjînê wê dike dixwaze wî bigre, lê di rûdana bûyerekê de ew çete dibeze û wî dihêle. Ew bi lez tiştên xwe ji siwariyê derdixin û dibezin. Di wê demê de çete kerwanê koçberan ji hev qut dikin û gelek malbatên li paş kerwanê mane vedigerînin Efrînê. Lê malbata Fatma xwe xilas dikin û li pey kerwanê diçe re dibezin.

Kalek tev hevjîna xwe bi pereyan malbata Fatma û ya mirovê wan bi xwe re derdixîne. Li ser pişta siwariyê siwar dibin, û ew keça jinûdayîkbûyî li çakêtekî sipartine ku ji ba biparêzin. Fatme dibêje "ew keçik di hembêza min de bû. Dayîka wê her gav dipirsiya ka keçika wê jiyan dike yan nefes qut bûye, min jî bi dizî destê xwe diavêt min hîs dikir ku hê nefes distîne". Fatma got ku dema ew gihîştin hacizê Dêr Hafir ku QSD'ê bûn, wan hîs kir ku ji nû ve ji dayîk bûne. Piştre erebe anîn û ew birin bajarê Tepqayê.

Malbata Fatma piştî bi rojan li derve û ser rêyan derbas kirin herî dawî berê xwe dan bajarê Qamişlo û niha li bajarê Qamişlo jiyan dikin.

## Ji Pênûsa Jin

### Cilûbergên pirrengî eyb tê dîtin!

**Nehîr Pale**

Li Sûriyê di adet û kevneşopiya hinek pêkhateyên Sûriyê de eyb û şerm e ku jin cilûbergên pirrengî li ber xwe bike. Li hinek civakan jî şermbûna cilûbergên pirrengî gihîştiye asta bi exlaq ve dane girêdan û jêre zagon diyar kirine. Pirrengî weke dewlemendî nayê dîtin, lewaziya exlaq dibîn in.

Di nava civaka zayendperest de, di mijara reng de pîvan ji bo jinê hatine diyar kirin. Jin di temenê zaroktî de cilûbergên pirrengî dikare li xwe bike, bi taybet rengê pembe ji bo keçikan û rengê şîn jî ji bo lawikan hatiye diyar kirin. Ev cewaziya reng gelekî kûr bûye, di asta lawik temenê wan hîna nebûye 5 salî ji malbat an jî derdora xwe fêr dibin ku rengê pembe yê keçikane û rengê şîn jî yê lawikan e. Nabe keçik rengê lawikan bikar bînin û lawik jî rengê keçikan bikar bîn in. Her wiha eybe keçikên temenê wan bûye 15 sal û jor rengên curbecur bikar bîn in. Ji ber ew ê bala mêran bikşînin. Ev tê wateyê ku keçikên cilûbergên curbecur li xwe bikin ew hewl didin ku bala mêr bikşînin ser xwe.

Jina hevjînê wê miriye temenê wê çiqas be nabe ku cilên reng bi reng li xwe bike. Ev yek eyb tê dîtin û dibêjin ji temenê xwe şerm nake ku cilên pir reng li xwe dike. Jina temenê wê mezin bûye, ew jî nabe ku cilên pir reng li xwe bike.

Di vê civakê de tenê rengê reş guncav ji jinê re tê dîtin. Jin neçarin di şênî, şahî û derketina ji derveyî mala xwe cilên ku rengê wan reş e li xwe bikin. Li gorî mejiyê vê civakê jina cilên pirrengî li xwe bike sivik e û ya tenê rengê reş li xwe bike ew baş e û bi isûl e. Jina ji hevjînê xwe qut buye, yan hevjînê wê miriye yan jî temenê wê mezin bûye nabe ku rengên curbecur li xwe bike. Eger jin ji derveyî mala xwe cilên pirreng li xwe bike wê têkeve devê xelkê û her kes li gorî tişta dibîne li ser vê jinê baxivin. Êdî ew jin ketiye rojeva wan, li gorî wan ji xwe re li mêran digere, sivike, adet û zagonên civakê binpê kiriye û wê di nava xwe de qebûl nakin.

Gava tu li kolanên gund û bajaran digere zêdetirî xwe rengê reş heye. Li çolan bajar jî werin ava kirin tenê rengê reş heye. Ji ber qedexe ye ku jin ji derveyî rengê reş li xwe bike. Ne tenê ruhê te tengav dibe, êdî tu dighîjê asta pêdiviya te bi rengên curbecur heye.

Jin tenê dikarin ji bo hevjînê xwe cilên pirreng li xwe bikin û xwe bixemilîn in. Ew jî ne li ber çavên kesekî, tenê ji hevjînê xwe re, xwe bixemilîne û dema dibe bûk dikare fistanê bûkaniyê yê spî li xwe bike.

Ji bo jin bala mêr nekişîne ser xwe û ji malbata xwe re pirsgirêk çêneke ew neçare li gorî civak ji wê dixwaze, tenê cilûbergên reş li xwe bike.



# Qada neftê ya Xor sedî 75'ê elektirîka herêmê jê tê hilberîn rastî êrîşan hat

Qada neftê ya Xor Morê ku ji sedî 75ê elektirîka herêmê jê tê hilberîn rastî êrîşê hat. Pispor diyar dikin ku êrîş ji aliyê Tirkiye û Îranê ve tên kirin. Bi van êrîşan hewl didin daxwazên xwe bi rêveberiya Herêma Kurdistanê bidin qebûlkirin. Lê hind çavkanî jî sedema li pişt van êrîşan cuda dinirxînin û balê dikişînin ser rezervên li Çemçemalê hatine tespîtkirin. Çavkanî destnîşan dikin ku herêma Kurdistanê di cîhanê de dibe wargeha sêyemîn a petrol û gazê.

**Navenda Nûçeyan**

Xor Mor devereke girêdayî navçeya Çemçemal a bi ser Silêmaniya Herêma Kurdistanê ve ye. Ji sala 1929an ve wekî qada petrolê hatiye keşifkirin. Her çiqas car car xebatên tespîtkirina rezervan hatibin meşandin jî xebatên esasî di sala 2007an de hatin destpêkirin. Di encama lêkolînên salekê de di qalîteya herî bilind de rezervên dewlemend hatin tespîtkirin. Li gorî daneyên fîrmaya venêrandinê Gaffney Cline Associates (GCA) li Xor Morê 75 trilyon fît kûp gaz û 7 milyar bermil jî petrol heye. Rezervên Xor Morê bala gelek şirketên cîhanê kişandin. Di sala 2008an de bi navê Pearl Petroleum konsorsiyûmek hate avakirin. Di nava vê konsorsîyûmê de şirketên Îmaretên Yekbûyî yên Ereban (ÎYE) ên bi navên Dana Gas û Crescent Petroleum, şirketa Avusturya OMV, Şirketa Macaran MOL û şirketa Almanan RWE hene. Ji sedî 70yê hîseyan aîdî du şirketên Îmaretên Yekbûyî yên Ereb û ji sedî 30 jî aîdî sê welatên din e.

### Îran û Tirkiye gefan li herêma Kurdistanê dixwe

Ev qada ji 2008an heta niha çalak e. Ji sala 2019an heta niha bi êrîşên dron û mûşekan tê rojevê. Ev êrîş caran bi Îranê û caran jî bi Tirkiyeyê tên îzahkirin. Lê di esasê xwe de heta niha rast bi rast tu kesan êrîş negirtine ser xwe. Bi giştî sedema van êrîşan jî wekî ku Îran û Tirkiye dixwazin polîtîkayên xwe bi Herêma Kurdistanê bidin qebûlkirin, tê dîtin. Bes li gorî çavkaniyên di qada hidrokarbonan de pispor mesele ji vê gelek kûrtir û tevlihevtir e. Çavkaniya ku agahî dan Ajansa Welat (AW), li ser sê xalan radiweste. Lê bi taybetî balê dikişînin ser xalekê. Çavkanî destnîşan dike ku sedemek van êrîşan polîtîkayên Îran û Tirkiyeyê ne û ev her du welat jî van êrîşan li hemberî Herêma Kurdistanê wekî gefekê bikar tînin. Çavkanî diyar dike ku piranî Tirkiye bi van êrîşan dixwaze polîtîkayên xwe bi Yekîtiya Niştimanê Kurdistanê û Îran jî bi heman êrîşan hewil dide daxwazên xwe bi PDKê bide qebûlkirin. Li gorî çavkaniyê heta Herêma Kurdistanê nebe xwediyê pergala parastina hewayî an jî welat qada esmanî ya Herêma Kurdistanê neparêze dê Xor Mor û qadên din ên gaz û petrolê wekî gefekê li hemberî kurdan bê bikar anîn.

### 'Bandora Rusyayê ya li pişt êrişan'

Heman çavkanî wekî sedema duyemîn jî balê dikişînin ser têkiliyên navdewletî. Çavkanî bi bîr dixe ku Xor Mor ji hêla konsorsiyûmek pir neteweyî û pir dewletî ve tê meşandin û ev yek jî dibe sedem ku zêde aktor tev li mijarê bibin. Li gorî çavkaniyê dewlet herî zêde li ser mijarên enerjiyê tên hemberî hev û girêdayî vê yekê dema firset dibînin li ser rê û çavkaniyên enerjiyê peyama didin hev. Pisporan bi taybetî bal kişandin ser rewşa ÎYE'yê û dibêjin ku ÎYE hem li ser axa xwe xwediyê rezervên mezin e û hem jî li Rojhilata Navîn, li deverên wekî Herêma Kurdistanê hewil dide bibe aktorê enerjiyê yê herî mezin û ev yek jî dibe sedema reqabeta siyasî û polîtîk. Li gorî çavkaniyê ev yek jî di aliyê aborî de herî zêde Îran û Rusyayê, di aliyê siyasî de jî Tirkiyeyê aciz dike. Bi vê boneyê wekî êrîşên li ser Xor Morê di asta yekemîn de Îran û Tirkiye dibînin û Rusyayê jî wekî teşfîqkarê van êrîşan dibînin. Li gorî dahurandinên pisporên enerjiyê ji ber dagirkirina Ukraynayê Rusya di bin ambargoyek mezin deye û balkişandin ser van mijaran: "Çeka herî girîng a Rusyayê petrol û gaz e. Piwistiya welatên Ewropayê jî herî zêde bi enerjiyê heye. Ku welatên Ewropayê ji deverek din enerjî peyda bikin dê ambargoya li ser Rusyayê hem girantir bikin û hem jî domdirêj bimeşînin. Lê ku çavkaniyan peyda nekin neçar in ku bi hind tawîzan bi Rusyayê re li hev bikin. Rusya ji bo Ewropa neçarî gaz û petrola wê bibe, hewil dide welatên din ên enerjiyê îxraç dikin, asteng bike. Herêma Kurdistanê jî wekî hedefek hêsan dibînin. Tirkiye û Îran jî ji ber sedemê siyasî van êrîşan pêk tînin."

### Rezervên Xor Morê di sektora enerjiyê serobino kir


Sêyemîn sedema êrîşên li ser Xor Morê ku li gorî pisporan sedema nayê zanîn lê ya herî girîng e jî rezerv in. Çavkaniyek li ser navê konsorsiyûmê li Xor Morê bi salan xebat meşandin destnîşan kir ku di sala 2018an li hevzaya Çemçemalê xebatên kefişkirina gaza xwezayî hate kirin û encamên balkêş derketin holê. Li gorî çavkaniyê rezervên hatine destpîtkirin di qada enerjiyê ya cîhanê de bû sedema şoqek mezin. Çavkanî sedema şoqbûna sektora enerjiyê jî balê dikişîne ser rezervên gaz û petrolên ên cîhanê. Li gorî daneyên SPE – Society of Petroleum Engineers di cîhanê de di aliyê dewlementiya petrolê de Venezûella bi 303 milyar bermilan di rêza yekemin de, Siûdî Erebistan bi 267 milyar bermilan di rêza duyemîn de, Îran bi 209 milyar bermilan di rêza sêyemin, Qanada bi 163 milyar bermilan di rêza çaremîn, Iraq bi 145 milyar bermilan di rêza pêncemîn, Îmaretên Yekbûyî yên Ereban bi 113 milyar bermilan di rêza şeşemîn, Kuveyt bi 102 milyar bermil di rêza heftemîn û Rûsya bi 80 milyar bermilan di rêza heştemîn û DYA jî bi 74 milyar bermilan di rêza nehemîn deye. Lê ev rêz di aliyê rezervên gazê de diguhere. Di aliyê rezervên gazê de Rûsya bi 1,688 trîlyon kûbîk fîtan di rêze yekemîn, îran bi 1, 200 trîlyon kûbîk fîtan di rêza duyemîn, Qetar bi 843 trîlyon kûbîk fîtan di rêza sêyemîn, DYA bi 615 trîlyon kûbîk fîtan di rêza çeremîn, Tirkmenistan bi 400 trîlyon kûbîk fîtan di rêza pêncemîn, Siûdî Erebistan 336 trîlyon kûbîk fîtan di rêza şeşemîn, Îmaretên Yekbûyî yên Ereban bi 290 trîlyon kûbîk fitan di rêza heftemîn, Çîn bi 265 trîlyon kûbîk fîtan di rêza heştemîn deye.

### Rezervên mezin hatin dîtin

Çavkanî rêza rezervan a welatan a berê bi bîr xist û diyar kir ku Iraq di aliyê petrolê de di cîhanê de dikeve rêza pêncemîn, lê di rêza gazê de tune bû. Çavkanî daxuyand ku li ser vê yekê li Iraqê lêgerînên tespîta gazê hatin meşandin û ev agahî dan: "Ji rojhilatê Kerkûkê ber bi qada Xor Mor heta devera Mîranê ku teva wekî hevzeya Çemçemal e rezervên mezin hatin peydakirin. Li gorî daneyan li vê herêmê li derdora 800 trîlyon kûbîk fît gaz heye. Bi guman di derxistina rezervan de tişta herî girîng şert û mercên derxistin û maliyeta wê ye. Li hevzeya Çemçemal hem qalîteya rezervan di asta herî jor de ye û hem jî bi boneya jeolojiya herêmê tekabûlî maliyetek normal dike. Vê yekê ji nişka ve çav û bala herkesê kişand ser vê herêmê. Wekî mînak ku ev qad tam bi kapasîte faal bibe dike tevahiya Ewropayê ji bo 250 sal îrade bike. Sedema herî girîng lê nayê aşkere kirin a êrîşên li ser Xor Morê ev e. Bi van rezervan Herêma Kurdistanê di cîhanê de kete rêza sêyemîn. Be ev ne rezerva tevahiya herêmê ye. Ev tenê rezerva herêma Çemçemal e. Ku li tevahiya Herêma Kurdistanê keşfî bê kirin îhtîmal heye Herêma Kurdistan derkeve rêza yekemîn."

### 'Îranê xwest bi destê Iraqê herêmê kontrol bike'











Pisporê enerjiyê hewildanên artêşa Iraqê yên di sala 2022yan de bi bîrxistin û ev agahî dan: "Li ser zêdebûna girîngiya vê qadê Îranê bi destê artêşa Iraqê xwest bikeve vê qadê û bigire bin kontrola xwe. Di rastiya xwe de jî di bin navê artêşa Iraqê de xwest hêzên Haştî Şabî li vir cih bike. Du caran hewil da lê bi destwerdana YNK û esasî jî bi destwerdana DYAyê ev hewildan hatin rawestandin. Ji wê demê heta niha bi dron û mûşekan bi dehan êrîş pêk hatin. Bi van êrîşan hem zext li ser Herêma Kurdistanê tê kirin, siyaseta welatên di nav konsorsiyûmê de tên dizaynkirin. Li aliyekê jî zexta li ser derxistina DYAyê tê zêdekirin. Lê Tirkiyeyê jî bi armanca tengaskirina YNKê car car bi dronan êrîş pêk anîn. Kurtasî bi êrîşên Xor Morê hêzên herêmê peyamên siyasî û polîtîk hem didin Herêma Kurdistanê, hem DYA û hem jî dewletên aktorên enerjiyê."

### 'Tirkiyeyê bi rêgehek enerjiyê ya nû xwest bibe aktor'

Çavkanî balê dikişîne ser hewildanên Tirkiyeyê û projeya Riya Pêşketinê (Kalkınma Yolu Projesi) bi bîr dixe û dibêje: "Wekî tê zanîn li hemberî Projeya Rê û Bendê (Belt and Road Înîtîatîve) a Çînê di pêşengiya DYAyê de bi navê Korîdora Aborî ya Hindistan-Rojhilata Navîn-Ewropayê (ÎMEC) di Lûtkeya G-20'an a li Hindistanê de hate aşkerakirin. Tirkiye derveyî vê projeyê hate hiştin. Li ser vê yekê Erdoğan daxuyanî da û anî ziman ku projeyek wiha bêyî Tirkiyeyê sernakeve. Her wiha bi armanca tevlêbûna projeya ÎMECê kete nav hewildanan. Bi navê Kalkinma Yolu projeyek çê kir. Hêza Tirkiyeyê ya bikaribe bi serê xwe an jî tenê bi Iraqê re projeyek wiha çê bike, tune ye. Bi vê yekê niyeta xwe ya tevlêbûna ÎMECê anî ziman lê heta niha bersivek negirtiye. Lê projeya pêşkêş kirî jî ji bo ÎMECê nexirab e. Rê kurt dike û mesrefê kêm dike. Esasê rê jî li ser çavkaniyên Iraq û taybetî rezervên Xor Mor, Teq Teq û derdora Çemçemal hatiye avakirin. Ji xwe Tirkiyeyê bi PDKê re xetek boriyan ji herêma di bin bandora PDKê dest pê dike, ji Duhok û Zaxoyê derbasî Silopî û ji wir jî di ser Mêrdînê re heta Amedê tê temam kir û li Amedê bi TANAPê re entegre kir."

### 'Aktorbûna Tirkiyeyê girêdayi pêvajoyê ye'

Têkildarî pêvajoya ji hêla Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi Tirkiyeyê re tê meşandin jî çavkanî balkişand hêmanên girîng û daxuyand ku aliyek pêvajoyê jî pişketinên enerjiyê û ji nûve dizayna vê qadê ye. Çavkanî wiha domand: "Li pêş perdeyê meseleyên siyasî têra xwe tên nîqaşkirin lê yên aborî zêde nayên dîtin. Dizayna Rojhilata Navîn a siyasî li gorî dîzayna rezerv û çavkaniyên enerjiyê tên kirin. Li gorî min a esas enerjî ye. Niha pêvajoyek wisa heye. Tirkiye ji bo derveyî dîzayna nû ya enerjiyê û girêdayî vê yekê dîzayna siyasî nemîne, kete nav hewildanan. Hewildana herî girîng jî destpêkirina pêvajoyê bû. Ji ber ku bêyî peymanek bi kurdan re çê bike, Tirkiye nikare di dîzayna nû de bibe aktor. Kurdistan hem aliyê ekonomik, rezervên binerd, hem cografîk, demografîk û hêza siyasî leşkerî de êdî li Rojhilata Navîn hêzek ji nedîtî ve bê nîne. Ev ji bo hemû aktoran derbasdar e û taybetî ji bo Tirkiyeyê. Ku pêvajo li ser esasê peymanek nû ya kurd û tirkan encam bibe, Tirkiye dê bi rihetî bibe aktorek sereke yê herêmê."

# Ji navdêrên jinên Kurd; Adîle Xatûn

**Ew jina navdar sala 1895'an li gel kesekî naskirî yê devera Helebcê yê bi navê "Osman" dizewice. Piştî mirina Mehmûd Paşayê Caf serokayetiya eşîra Cafan dikeve stûyê Osman Paşayê Caf û Adîle Xanim jî dibe hevkara hevjînê xwe.**

Zana Roj

Jinên Kurd her ji serdemên berê ve xwediyê bîr û hişmendiyên taybet bûne û di nav civata Kurdan de jî gelek jinên zana û zîrek derketıne û bala civata Kurdî û bala gelek dîroknivîs û rojhilatnasên biyanî kişandine û bûne cihê serbilindiya netewa Kurd.

**Navdêrên biyanî çi li ser jinên Kurd gotine**

Di vê derbarê de Kurdnasê Rûsî, "Viladimîr Fiyodorvîç Mînoriskî", Kurd wek pêşkeftîtirîn û şaristaniyetirîn netewe daye zanîn. Mistir Rîç jî jinên Ereb, Tirk û Fars li gel jinên Kurd helsengandin kiriye û gotiye, jinên Kurd derheq pile û serbestî û zîrekatiya û damenpakiya xwe li jinên netewên din pêşkeftîtirin.

Herwisa jinên Kurd cihê rêz û pesindana gelek gerok û rojhilatnasên din ên biyanî bûne.

Mêcerson, Efserê Siyasî û Rojhilatnas ê Brîtanî derbarê Adîle Xanimê de wiha gotiye: Adîle Xanim jineke desthilatdar, civakî û bazirganî ye û ew hewla şaristaniyetsazî û bînasaziyê di Helebcê de dide".

Yek ji wan jinan ku cihê serbilindiya netewa Kurd e û zîrekatî û payebilindiya wê ketiye ser zimanê biyaniyan, Adîle Xanim e.

**Ev jine kî bûye ku wiha kesên bi navûbang ên biyanî behsa wê kirine.**

Malbatek piştî jinavçûna mîrnişîna Baban di sala 1851'an de li bajarê Silêmanî ber bi bajarê Sinê ve ku wê demê ew bajar di bin desthilata Erdelan de bûye, nîştecî dibe û ew malbat jî ya Ebdullqadir Begê kurê Hemîd Beg bû. Adîle Xanim ji wê malbata naskirî li sala 1859'an di vî bajarî de ji dayîk bûye. Jiyana Adile Xan di bajarê Sine de derbas dibe.

Ew jina navdar sala 1895'an li gel kesekî naskirî yê devera Helebcê yê bi navê "Osman" dizewice. Piştî mirina Mehmûd Paşayê Caf serokayetiya eşîra Cafan dikeve stûyê Osman Paşayê Caf û Adîle Xanim jî dibe hevkarê mêrê xwe.

Dema ku Osman Paşa sala 1905'an diçe ser dilovaniya xwe û koça dawî dike, Adîle Xan hemû karûbarê eşîra Caf birêve dibe û nav û bangê wê li hemû deverê Şarezor û Hewreman û cihên din ên Başûrê Kurdistanê belav dibe û herwisa rêzeke zêde jî di nav xelkê Rojhilatê Kurdistanê de li hember wê tê nîşandan.

Ew jine di dawiya sedsala 19'an û destpêka sedsala 20'an de roleke girîng li dîroka civata Kurdî ya wê serdemê û nemaze li navçeya Helebce û Şarezor û Hewramanê de dilîze.

Birêvebirina karûbarê eşîreteke mezin li devera Helebce û deşta Şarezor û afirandina pêwendiyên bihêz li gel Îngilîziyan karê herkesê nebû, lê wê jina Kurd a zîrek ew erk da ser milê xwe.

Piştî serkirdayetîkirina eşîreteke mezin a wekî eşîreta Caf, desthilata wê ewqas mezin bû ku bi Şajina bê Tac a Şarezorê hatibû nasîn.

Bajarê Helebce bajarek ku niha bi bajarê kîmyabarankirî tê naskirin, bi saya serê Adîle Xanim, Osman Paşayê hevjînê wê û Tahirbeg û Ehmed moxtar Begê kurên wê, gelek bîna û gelek avedaniyên din bi xwe ve dîtin. Bajarê Helebce di serdema Adîle Xanimê de ji gundekê hatî piştguh kirin, gavên ber bi bajarek avedan û pêşkeftî ve avêtin.

Adîle Xanim di vî bajarî de rêya bazirganiyê li gel bajarên ku cîranên wan bûn vekir û gelek dukan û bazar avedan kir.

Her wek tê zanîn, Adîle Xanim yekemîn Qaymeqama jin di dîroka Iraqê de bûye û di sala 1909'an ew bûye Qaymeqama Helebceyê. Ew ne tenê Fermanrewayê rasteqîne ya wê deverê bû, belkî ew di asteke bilind a siyasî de bû; wê dadgeha taybet bi xwe hebû û girtîgehek çêkiribû û bi xwe serpereştiya dadgehê dikir û kesên xirabkar siza dida, herwisa koşk û talarên xweşik çêkiribû û rêkûpêkiyek di Helebceyê de afirandibû û ew gundê ku di serdema dagîrkeriya Osmaniyan de hatibû jibîrkirin, bû bi bajarekî siyasî û bazirganî û heta wisa lê hat ku pexîlatiya Osmaniyan bi vî bajarî re dihat, lê heta bo carekê jî Adîle Xanimê îzin neda ku Osmanî baregehên xwe di devera wê de damezrînin.

"Mîs Bêl" wê serdemê nûçegehaneka Birîtanî li Rojhilata Navîn bû û sala 1921'an bo serdanekê diçe Helebceyê û çavê wê bi Adîle Xanim dikeve û bi bejin û bala Adîle Xanimê



re nivîsiye: "Em wekî Brîtaniyan nabe hesabê bo Adîle Xanimê nekin, ew di deverê de baladest e, fermanrewayê eşîra Caf e, bi şiyan e û şiyana wê di astekê de ye ku mirov nikare heta bîr jî lê bike, herwisa ew jineke balkêş e û bi kincên Kurdî rind û xweşik e".

Wê jina navdar di warê aborî de geleg xizmetên mezin bi xelkê xwe kir, wê bi desthilatdariya xwe ev yeka nîşanê welatên cîhanê da ku jinên Kurd di wê serdemê de jî li gel mêran wekhev in û dikarin di nav civata Kurdan de bigihin bi desthilatê û heta dikarin di nav karên siyasî de jî beşdarî bikin.

Di vê derbarê de Kurdnasê Rûsî, Viladimîr Fiyodorvîç Mînoriskî, sala 1909'an serdana Başûrê Kurdistanê kiriye û herwiha ber bir Helebcê ve jî diçe û dibe mêvanê Adîle Xanimê û di bîreveriyên xwe de wiha gotiye: "Adîle Xanim jineke bêmînak bûye û ew kesek têgihîştî û xwediyê kesayetiyeke bihêz bûye".

"Edmondiz" Efserekî artêşa Brîtanya li Başûrê Kurdistanê, derbarê Adîle Xanimê de wiha gotiye: "Hemû desthilata Osman Paşa piştî mirina wî ket destê jina wî, ku di rastî de ew jin şajina tac pê nedayî ya Şarezorê bûye".

Adîle Xanimê gelek hez ji pêşxistina xwendinê kiriye û her lewma jî çendin dibistan avedan kirin. Piştî xizmetek zêde bi xelkê xwe re, ev jina navdar li roja 11'ê Nîsana 1924'an diçe ser dilovaniya xwe û koça dawî dike û li goristana Ebabeyl li bajarê Helebcê bi axa pîroz a Kurdistanê tê spartin.

Wê jina navdar bi anîna şaristaniyeke modern di nav xelkê xwe de û bi kar û xizmetên ku bo netewa xwe kir, bo mînakek bo hemû jinên li dû xwe û da xuya ku jin jî dikare bandorek mezin li ser civata xwe ava bike û dikare di gelek waran de bo pêşxistina netewa xwe xizmetê bike.

# Têkiliya jin û xweza

Viyan Egîd

Jin û xweza kokên sereke ne ku di tevahiya dîrokê de jiyanê xwedî kirine. Bêguman ev girêdan jî piştî şoreşa çandiniyê parçe bû û heta modernîteya kapîtalîst berdewam kir, ji ber vê yekê di roja me ye îro de jin ji nû ve bi destê xwe jiyana bi xwezayê re dihune. Têkiliya di navbera jin û xwezayê de têkiliyeke rasterast û bi bandor e ku ne mumkine were qut kirin. Jin bi rola xwe ya civakî û malbatî, bêguman jin ya herî zêde ku ji aliyê hawirdorê hişyare, mîna şewat, zirarên li çînatiyê, qirêjkirina bajêr ango gund û ajalan û krîzên din ên hawirdorî, ji ber vê yekê jin her neçar dimêne ku tevbigere û hewl bide van ziraran kêm bike. Her wiha, rola wan di perwerdekirina nifşên nû de dikare hişmendiya hawirdorî xurt bike. Xweza perçeyek ji jinan e û ya herî zêde bi xwezayê re mijûl dibe jin e, ji ber ku kesayeta jinan mîna xwezayê afrîner e. Di heman demê de jin dikarin xwezayê biparêze û di warê parastinê de dikare jiyaneke azad bide afrandin. Tevî astengiyên pergalên desthilatdariya mêr jî ne tenê ji bo xwe, lê belê ji bo xwezayê jî têdkoşin. Xweza gelek caran bûye hedefa dewletên dagirker ku dixwazin têkiliya jin bi xwezayê re qut bikin. Armanca wan ew e ku di nava pergala kapîtalîst de xwe bi hêz bikin. Di navbera wan komên ku xwezayê xerab dikin. Bi sedan salan jin û xweza ketin bin tehekuma feraset desthilatdariya mêr û hêzên texrîbkar. bêguman ev bi salane ku polîtîkayên şerê taybet li ser xwezayê tê meşandin. Xweza bi talan û qirkirinê re rû bi rû ma. Heya roja îro li Kurdistanê qirkirina xwezayê didome. Ji bo bidawîkirina qirkirina li ser xwezayê, pir jin hene ku li beramberî vê yekê hewldanên ji bo parastina xwezayê tekoşîn dikin û nerazîbûnên xwe derdixin hole, jin her dem di refên li pêş de ye. bêguman jinan ji bo parastina xwezayê gelek çalakî li dar xistin, bi taybetî jî ji bo paqijkirina herêmê. dema ku derfet ango alîkarî ji jinan re were dayin, wê bi tekezî jiyaneke paqij û tendurist were jiyîn, ji ber ku jin ji mêran zêdetir xwedî li parastina xwezayê derdikevin. Dema mirov dibêje jin jiyane û bihuşte, ne tenê gotineke û tê gotin, helbet jiyana bê jin, mîna dujehekê ye, ji ber ku nirxê herî mezin di civakê de jin û xweza ye.

Her wiha jin çiqas bikaribin zêdetir bi xwezayê re têkiliya xwe xurt bikin ewqas wê were parastin, jin wê bikaribe ji pergalên desthilatdariya mêr û dijmin, xwe û xwezayê rizgar bike. Nêzikahiya ji bo parastinê ya jinan a ji bo xwezayê çiqas bi hêz bibe wê azadiya hevdem a jinan û xwezayê jî nêz bibe. Ev têkilî, her ku bi hêz bibe dê bi xwe re hilweşîna pergala mêr bîne.



# Hesen Koçer: Nenavendîbûn ne parçebûn e, çareseriya siyasî û îdarî ye

**Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Cîbcîkar a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hesen Koçer diyar kir ku eger li Sûriyê li şûna navendîbûnê, nenavendîbûn pêş bikeve wê gelek pirsgirêkan bi xwe re çareser bike û wê bikaribe sîstema dewletê hêsantir bike û got, "Li cîhanê sîstemên nenavendî bihêzin û siyaseta wan xurt e, pêwîstiya Sûriyê jî bi vê sîstemê heye."**

Ronaz Silêman/Reqa

Derbarê girîngiya pêkanîna sîstema nenavendî ji bo Sûriyê, Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Cîbcîkar a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hesen Koçer bersiva pirsên Rojnameya me de û hevpeyvîn wiha bû:

**Di demeke dirêj de Sûriyê li ser sîstemeke navendî tê birêvebirin, ev sîstem bi xwe re gelek pirsgirêk derxistin holê, ji bo wê pêwîstiya Sûriyê bi sîstemeke çawa heye?**

Piştî şerên giran li dunyayê yên olî, mezhebî û netewperestî pêş ketin, bi xwe re kirîzên pir kur anîn, bi vê jî yek pare, sîstemekî navendî ku desthilatê li ser civakê bike, pêş ket. Di Ewropa de ev şer hebû û di hundirê wê de pêş ket, heta navê wê xistin şerê sed sal û 30 sal. Lê piştî ew gihaştin encamekî wisa bi vê sîstemê civak nameşe, êdî dest bi guhrandinên cîdî di çeksazkirina sîstemê de kirin, guhertinên ku dan çêkirin jî ev; sîstemekî nenavendî, heta sîstemên xwecihî di hundirê Ewropa de pêş ketin, ji federasyona bigre heta kantonan, heta yekîtiyan jî lê pêş ketin. Di heman demê de li hemberî sîstema navendî serhildan û şoreş, hem jî hewldanên guhrandina wê çêdibin, ji ber wê mecbûr bûn xwe biguherin. Niha di Rojhilata Navîn de eynî kirîz didome ku di sedsala 18 û 19'an de wekî şert û mercên Ewropa jiyan dike. Çawa sîstemekî netewperestî û olperestî di hundirê Ewropa de hebû, li Rojhilata Navîn xwe dûbare dike. Ji ber ku dewletnetewên di Rojhilata Navîn de hatine avakirin, hemû jî li ser bingehê navendbûnê pêş ketine, Sûriyê jî yek ji wan e. Piştî peymana Sayks-Pîcot dewletnetew çêbûn, dewletnetew jî taybetmendiyên xwe navendî ne, ji ber netewek tenê hukim dike, netewên dîtir qir dike û komkujiyên çandî li ser civakan dide meşandin, di encamê de yek reng û yek zimanî derdixe ortê, ev li Rojhilata Navîn li pêşe, heta niha jî wiha ye. Sîstema navendî jî desthilatdariya hişke û desthilatdarî di Rojhilata Navîn de kokên xwe pir kur in ku heta berî Someran jî diçe. Desthilatdarî ji sûlala dest pê kiriye, sûlalên Rojhilata Navîn jî wekî malbatî dest pê kiriye û wiha hatiye. Sîstema navendî jî sîstema hukimdariya zilam e, ji ber malbat li ser bingehê zilam navenda bingehîn hatiye girtin û li gorî wê di dewletê



de jî dîsa zilam esas hatiye girtin. Di Rojhilata Navîn de ji ber vê yekê sîstemên navendî piranî hukim li ser gelên wê dikin. Van sîsteman jî encamên wê têkçûyîne. Di heman demê de piştî pêşketinên ku di Ewropa de pêş ketin, bi taybet sîstemên kapîtalîzm, êdî dewletnetew berjewendiyên kapîtalîzmê pêk nayîne, ji bo wê ne ku ji bo civaka dixwaze guhertinan çêke, gorî fînas-kapîtalîzma ji nû ve xwe birêxistin dikin. Êdî navendîbûn ji bo kapîtalîzma malî zehmet e, wek berê hişkbûna dewletê ji bo kapîtalîzm bikarbe xwe pêş bixe, zehmet e, lewra kapîtalîzm dixwazin van sîsteman biguherin, ew jî li gorî berjewendiyên xwe.

Ji bo wê sîstema nenavendî sîstema herî nêzî rastiyê û xwecihî bingeh tê girtin ku civakên xwecihî dikarin xwe bidin meşandin. Lewma eger em bixwazin li Sûriyê çareserî çêbibe, bi sîstemên navendî çareserî çêbibuya wê rejîma Baas û Sûrî, sîstema Iraq û sîstemên dewletên erebî serkeftî biya, lê tiştê tê famkirin sîstema navendî ne serkeftî ye, nikare berjewendiyên civakê biparêze û civakê nav kirîzan de, dide dewamkirin. Ji bo wê eger em pêwîstiyên Sûriyê bînin rastiyê, sîstemeke nenavendî dixwaze. Di Nav axa Sûriyê û nav yekbûna dewletê de, sîstemekî nenavendî ku nenavendîbûna siyasî û îdarî bi hev re be, lazime ku taybetmendiyên civaka bingeh bê girtin, rola partiyên siyasî û siyaseta demokratîk hebe, civaka Sûriyê bikaribe xwe îfade bike, heqê hemwelatiyan bingeh bê girtin û hwd…. Herwiha pêwîst e sîstemekî nenavendî be ku civak bixwe karibe pirsgirêkên xwe çareser bike, ew pirsgirêk di navendê de kom nebe. Ji ber dema hemû pirsgirêk li navendê kom dibe, ew navend nikar çareser bike, heta navend ne xwesteke wê ye çarerser bike. Dewlet pirsgirêkên civakê çareser nakin, aloztir dikin. Lewra eger em bixwazin sîstemekî nenavendî bingeh bigirin, lazime her parêzgehek û herêmek di nav tensîgek dewletê de xwe birêve bibin. Dewlet bibe rola munesiq di hundir sîstema nenavendî de ku ne her tişt di destê deweletê de be, qanûnê dewletê jî hebin û mafê civakê di hundirê wê de bê parastin û her du jî ji hev re hurmetê bigirin, pêwîst e bi vî rengî pêş bikeve. Lê tiştê niha pêş dikeve ne wiha ye, ji bo wê eger navendî bingeh bê girtin, wê kirîz dewam bike û pirsgirêkên cidî derkevin.

**Ger li şûna sîstema navendî, nenavendî pêk bê, wê ev yek ji bo Sûriyê bibe bersiv û çareseriyeke çawa?**

Heger şûna navendbûnê, nenavendî pêş bikeve wê gelek pirsgirêkan bi xwe re çareser bike ku êdî civak bixwe wê pirsgirêkên xwe çareser bike, ew herêm bixwe bikaribe biryaran derheqê xwe de bistîne, pirsgirêkê aborî, siyasî, civakî û xizmetê nîqaş bike. Nenavedî wê deha sîstema dewletê bikaribe rehet bike, dewlet tenê rola munesiq bilîze, ne mudaxela civakê bike. Lewra nenavendî girînge û hemû pirsgirêkên Sûriyê çareser dike. Dema em vê dibêjin jî em ne behsa parçebûnê dikin, ji ber gelek nerînên şaş li ser vê hene. Ev hemû jî ne rast in, ji ber heqîqetê wê di hundirê dinyayê tevahî de heye ku sîstemên nenavendî hin xurtirin, bihêzin û siyaseta wan xurt e. Heger dewletên Ewropî wekî Emerîka wiha bihêze, ne tenê bi çekên xwe, lê ji ber sîstema xwe ya hundirîn nenavendî ye, ev jî hêzê dide dewletê. Ji bo wê sîstemekî wiha pêş bikeve, mumkine pirsgirêka Sûriyê hêsantir bê çareserkirin. Lê heger ferzkirina sîstema navendî bê kirin, çarenûsa rejîma Baase. Heta niha piştî hilweşandina Baas tu guhetinên cidî di Sûriyê de çênebûne, ew jî pirsgirêk bi xwe re derxistine.

**Çima kesên li ser desthilata Sûriyê ji sîstema nenavendî ditirsin û wê qebûl nakin, sedema vê yekê çi ye?**

Kesên li ser desthilatdariya Sûriyê berê û niha jî zihniyeta desthilatdarî û navendî bingeh digirin, ji bo wê naxwazin ev erk ji dest wan derkevin û teslîmî civakê bikin. Da ku desthilatdariyê li ser civakê bike. Herwiha dema şexis zihniyeta desthilatdariyê û erkê dewletê ji bo xwe bingeh bigre, nikare sîstema nenavendî qebûl bike. Lewra propaganda ku nenavendî parçebûne pêş dixe, da ku desthilatdariya xwe veşêre û berjewendiyên gelên Sûriyê naxwazin, eger berjewendiyên wan bixwaze, wê ji destpêkê sîstema nenavendî çêkin, ji ber Baas jî navendî bû. Gerek ev xal bê famkirin ku serokên dewletan piryanî xwe wekî qiral xweda û temsîlciyê ezmanan hesab dikin, bi taybet serokên dewletên di Rojhilata Navîn de. Hin sîstem di Rojhilata Navîn de ji dema Someran de hene, ewqas dewletekî paşketî ye. Giştî dewlet di Rojhilata Navîn de rola parlemeto tuneye, da ku em rola wê bidin çêkirin gerek erkên di destê şexis de, teslîmî civakê bibe.

**Komkujiyên ku niha li hin deverên Sûriyê pêk tên, çi nîşan didin?**

Piştî têkçûna Baas hêviyên Sûriyê mezin bûn ku guhertinek di Sûriyê de bê kirin, lê ew hêvî neçûn serî û hêviyên wan ji vê sîstema niha şikestin. Gotin em ji sîstema heyî û dîktatorekî xilas bûn, wê sîstemekî nû pêş bikeve, lê dîtin sîstema niha hin bêhtir li ser bingehê nijadperestiyê, olperestî û netewperestiyê pêş ket, şoreşa Sûriyê jî li hemberî van tiştan derketibû. Ji bo vê yekê komkujiyên ku hatin kirin, dewamkirina sîstema berê ye. Li ser destê sîtema berê gelek insanên Sûrî hatin kuştin, lê niha bêtir tên kuştin. Ji bo wî divê em fam bikin komkujiyên li ser Elewî û derziyan çêbûn, rojane di Sûrî de insan tên kuştin, ewlekarî di Sûrî de nemaye, bi taybet di herêmên hikumeta Şamê de. Ji ber insan nizane wê li ser nasname, netew an zimanê xwe bê kuştin. Pêwîst e demokrasî pêş bikeve heta istqrarbûn pêk bê, ji ber herdû bi hev ve girêdayî ne. Komkujiyên hatin bi serê civaka Sûriyê piştî Baas, hêviyên gelên Sûriyê dan windakirin. Herwiha ji ketina Baas heta niha guhertin pêk nehatin, tersî wê rewş ber bi xirabûnê ve diçe, zimanê nefretê pêş ketiye û bi zimanê nefretê sîstem çênabin. Rewşa Sûriyê wiha dema bike wê encamê nebaş be. Lewma pêwîst e sîstem û destûrekî demokratîk di Sûriyê de pêş bikeve ku civak ji van komkujiyan xelas bibe.

**Ev demeke mijara entgerasyonê di nîqaşê de ye gelo wê ev pêk bê yan na?**

Ji destpêka şoreşa Sûriyê heya niha, me dest bi şoreşê kir şoreşa Rojava bangewaziya me yeke û heta niha dewame bangewaziya me yên Rêveberiya Xweser û giştî jî ev e; sîstem û destûrekî demokratîk, yekbûna û parastin erdên Sûriyê, pêşketina aştiya civakî di Sûriyê de. Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî hem aborî û hem gelên xwe bi gelên Sûriyê ve girêdayî ye. Lê ne sîstema berê me guhdar kir ne sîstema niha li me guhdar dike. Sîstema berê di navendîbûnê israr kir di encamê de hilweşiya, ev sîstem jî heger xwe neguhere, wê encamên pir nebaş derkevin holê. Ev sîstem gerek ne li gorî ya berê nêz bibe, hinekî li civaka Sûriyê guhdar bike û aştî bi gelê Sûriyê re çêke. Îro behsa aştiyê bi dewletên derdor re çêkê dike, destpêkê divê di nav civaka Sûriyê de bidin çêkirin. Lê tiştê xuya dike guhdar nakin me her tim behsa entegrasyonê dikir, belkî peymana 10'ê Adarê tê fakirin, lê dereng dixin naxwazin ev danûsetndin çêbibin, dixwazin dewletekî bi serê xwe çêkin.

Di aliyê peymanê de jî dixwazin propogana bikin ku Rêveberiya Xweser û QSD'ê pêk nayîn, ev hemû ne raste em ji destpêkê bi peymanê re ne û me got em ê entegrasyon bikin. Em a tiştê ji engrasyonê tê famkirin gelek jê şaş fêm dikin ku em ê herin saziyê xwe di nav saziyê dewletê de bihelînin, artêşa xwe belav bikin û tevlî artêşa Sûriyê bibin, entegrasyon ne wiha ye, entegrasyon du îrade derdikevin ortê ji bo pirsgirêkên xwe çareser bike hinek rêgezan datîne û li gorî wê rêzgirtina hev digirin, ji bo ku di nav yek dewletê de tevger bikin. Lê heger îro mafê Kurd, Elewî, Derzî û hwd… di destûrê Sûriyê de nehatiye nîvisandin wê çawa guhertin di Sûriyê de were çêkirin. Gerek ev xala baş bê nirxandin, entegrasyon jî wê li ser vê bingehê be, sîstema nenavendî entegrasyone esasen. Wekî ku wê nenavendî pirsgirêkên Sûriyê çareser bike, entegrasyon jî wê li ser vê bingehê be, em jî dixwazin vê çêbikin û em amade ne. Lê yê vê yekê dergen dixe hikumeta Sûriyê ye. Heger bêjin QSD tek tek tevlî bibin wê DAIŞ di tevahî Sûriyê de zindî bibe, ji bo wê mana QSD garantiyek ji bo Sûriyê û garantiya ewlekariya cîhanî ye. ji bo wê xurtibûna QSD'ê çêbikin û tevlîbûna artêşa Sûriyê çêbibe, li ser vê bingehê li hemberî DAIŞ'ê têkoşîn bê dewamkirin, em ê li ser vê bingehê entegrasyon bikin.

# Temenê berjewendiyên desthilatdarên Sûriyê bi têkçûna wan diqede

Di qonaxa nû ya Sûriyê de pêşxistina diyalogên ku mafê gelên Sûriyê bingeh digre girîng in, ji ber berjewendî wê ne rêya çareseriyê be û temenê desthilatdaran li ser vê bingehê wê bi têkçûnê biqede. Herwiha ji her demê zêdetir girîngiya gelên Sûriyê bi hevgirtinê heye, êdî şer çarseriyê nayîne holê.

**Navenda Nûçeyan**

Sûriyê axa ku ji rengê pêkhateyan hatiye avakirin, lê ew pêkhate di nav de bê wate bibûn. Li ser axa Sûriyê bi salên dirêj siyasteta ku her şer, pevçûn û kirîz lê rû dane, hatiye meşandin, ev siyaset şaxên xwe berdaye heya roja me ya îro û xwe didomîne. Ne tenê rejîma Baas desthilatdarî li ser Sûriyê kir, lê gelek kes cihên xwe li ser desthilata Sûriyê dane avakirin û xwîna gelên Sûriyê ji xwe re kirin armanc, armancên bi vî rengî jî bi têkçûnê rû bi rû man. Ji ber ku temanê berjewendiyên desthilatdarên Sûriyê bi têkçûna wan qediya. Rêjîma Baas jî rastî vê yekê hat.

Sûriyê veguherîbû dewleteke leşkerî

Rejîma Baasê ji sala 1963'yan ve Sûriyê veguherandibû dewleteke leşkerî. Piralîbûn û demokrasî ji holê rakiribû û hemû derfetên welat xistibûn destê çend kesan.




Di pêvajoya desthilatdariya rêjîma Baas de ku bi dehên salan dom kir, rejîmê nekarî xwestekên gel bi cih bianiya, ji ber gendelî û nepotîzma komkirina her tiştî li welat di destê komeke nêzîkî desthilatdariyê de bû, ev yek jî bû sedema gurbûna aloziyên aborî û civakî. Herwiha aloziya ku di warê aborî û civakî de li Sûriyê tê jiyankirin, xizanî bi pêş xistiye û ev yek metirsî li ser siberoja Sûriyê daye avakirin.

Di nava tevilheviyê de çeteyên ji hemû cîhanê derbasî Sûriyê bûn

Bi pêla "Buhara Gelan" a ku li Tûnisê dest pê kir û derbasî Lîbya, Misir û welatên din ên Ereban bû, di Adara 2011'an de li dijî rejîma Baas xwepêşandanên mezin dest pê kirin. Lê rejîmê li şûna pêkanîna reforman, bikaranîna hêza leşkerî li dijî xwepêşandêran bersiv da. Di encamên vê tevilheviyê de çeteyên tundraw ji her deverên cîhanî derbasî Sûriyê bûn. Herwiha bi berdewamiya krîzê re, piştî ku rejîma Baasê qadên berfireh ên welat ji dest dan, Sûriyê veguherî qada pevçûnên navneteweyî û herêmî. Hêzên mezin ên wekî Rûsya û Îranê ji bo piştgiriya rejîmê destwerdan kir, Tirkiyê jî rasterast ji bo piştgirîkirina komên girêdayî wê destwerdan kir. Rewşa Sûriyê bi vî awayî xwe domand, lê di 8'ê Kanûna 2024'an de ev rêjîm hilweşiya û qonaxeke nû li Sûriyê dest pê kir. Di qonaxa nû ya Sûriyê de jî hikumeta veguhêz a Sûriyê bû berdewamiya siyaseta Baasê.

Bakur û Rojhilatê Sûriyê parçeyek ji Sûriyê ye

Li ser erdingariya Sûriyê, herêma Bakur û Rojhiltê Sûriyê jî heye, ev herêm xweseriya xwe ji aliyê pêkhateyên ku lê jiyan dikin ragihandiye û ev bi salan pêk hatiye. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rêveberiya Xweser û hêza QSD'ê sîwanên herêmê ne. Ev rêveberî di demên awerte ku hewcedariya gel pê hebû hate avakirin û hêza QSD'ê jî bi heman awayî li dijî çeteyên herî hov ên cîhanê DAIŞ'ê şer kir. Rêveberiya Xweser û QSD'ê her li dijî şer in û her dem destê aştî û diyalogê dirêj dikin, da ku armiyeke mayînde ji bo gelên Sûriyê pêk bê. Lê aliyên ku desthilatdariyê li ser Sûriyê dikin her xwe ji vê yekê dikşînin, ew jî ji ber destwerdanên derve li ser wan tê kirin û ew ne xwedî biryarin di redkirina van destwerdanan de.

Divê qonaxa niha li ser pêşxistina diyaloyê pêk bê

Pêşxistina diyalogê ji bo siberojeke demoratîk ji aliyê Rêveberiya Xweser û hêzên Sûriya Demokatîk QSD'ê ve bi hikumeta veguhêz a Sûriyê re tê kirin. Lê hikumet veguhêz her vê diyalogê tolaq dike û hincetên cur be cur derdixîne pêş. Ev yek jî di danûstendinên van aliyan bi hev re piştras dike. Ji ber ku ev dibe salek hikumeta veguhêz di Sûriyê de xwe bi cih kiriye û ji dema hatina wê û heya niha gelek danûstendin pêk hatine, di nav de jî lihevkirin hatine îmzekirin, lê hikumet wan lihevkirina binpê dike û rewşê aloztir dike.

Gavên pêwîst ji bo Sûriyê divê werin avêtin

Ger ev yek bi vî rengî bê domandin hêviya Sûriya nû a ku xwe li ser wekheviyê bigere, wê neyê avakirin. Ji bo wê di destpêkê de pêwîst dike hikumeta veguhêz rewşa giştî Sûriyê berçavan bigire, sîstema navendîbûnê bidawî bike û nenavendî pêk bîne, ji ber nenavendî pirengiya Sûriyê di hemû aliyan de wê bigre dest. Ya girîng jî lêvegereke di binesaziya avakirina vê hikumetê de gereke ku ew kesên ne ji Sûriyê û bi taybetî kujerên ku di nava desthilata wê de cih digirn, bên cezakirin. Di heman demê de zihniyeta vê hikumetê were guhertin, destûrên rewa ku temsîla Sûriyê bi rastî bike, bên çêkirin. Herwiha jin di nava Sûriyê de neyê paşguhkirin û rola wê ya sereke bê bicihkirin.

## Tirkiyê leyîstina rola xirabker didomîne



**Zekî Bedran**

Mehek derbas bû ji civîna dawî ya di navbera rayedarên hikumeta veguhêz ya Şam û nûnerên Rêveberiya Xweser de. Di vê civînê de teqezî li ser tevlîbûna QSD'ê di nav artêşê de hat kirin. Li hev kirin ku QSD dê hebûn û pisporiya xwe ya bêhempa li herêmê biparêze. Di navbeynkariya nûnerên DYA ev civîn hat meşandin. Li gorî vê yekê, navên kesên di bi fermandariya QSD'ê de cih digirin û hêzên Ewlehiya Navxweyî de ji Şamê re hatin dayîn. DYA jî lez kir ku navan pêşkêş bike û wan fermî bike. Lê, tevî wan hewildanan jî, ji Şamê ti bersivek nehatiye wergirtin. Desthilatiya HTŞ"ê bi berdewamî ji raya giştî ya navxweyî û navneteweyî re propagandayê dike ku QSD û Rêveberiya Xweser li hevdîtinan dereng dixin û li dijî entegresyonê radiwestin. Lê, ti gavên pratîkî nehatine avêtin. Hevdîtinên ku heta niha hatine kirin di encama destwerdan û hewildanên welatên wekî DYA û Fransayê de hatine kirin. Ji ber gefên Tirkiyê niha Fransa di navberê derketiye. Ji ber ku ti derfetên wan tine ku DYA ji gefan bixwun, hin hevdîtin di bin navbeynkariya wan têne kirin. Ahmet Şara di serdana xwe ya DYA yê de gotinên xwe yên bi sûcdarkirin û gefxwarina li dijî QSD'ê û Rêveberiya Xweser domand. Bi taybetî Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyê daxuyanîyên ku weke QSD dijî entegresyonê ye û wiha gotin: "QSD tevî hemû hewldanên entegrasyonê li ber xwe did in". Wezîrê Karên Derve yê hikûmeta vegûhêz yê Şamê peyamên bi vî rengî berdewam kir. Lê, rayedarên DYA, yên ku hema hema hemû civînên ku ji aliyê nûnerên hikûmeta vegûhêz û Rêveberiya Xweser ve hatine lidarxistin sazûman kirin û beşdarî wan bûn, bi berdewamî gotin ku ev ne rast e. Ji ber vê yekê, wan ev daxuyaniyên ku Şam û Enqerê didin piştrast nekirin û derewandin. Berovajî vê jî, wan diyar kir ku QSD rola xwe dilîze û hezêke sereke û girîng li herêmê ye. Rayedarên Tirkiyê, ku di civînên Qesra Spî ya li gel Ehmed Şara de nekarî encamê dixwest bi dest bixe, xuya ye ku piştgiriya ku ji Trump hêvî dikir negirtiye. Trump diyar kir ku entegrasyon û pirsgirêk divê di çarçoveya Peymana 10'ê Adarê de werin çareser kirin.
Bi salan e ku hikûmeta Tirkiyeyê her tiştê ku di destê wê de bû kiriye da ku Rojava ji holê rake û QSD'ê jî têk bib e. Wan hêviyeke mezin bi hevdîtinên Trump ve girêdabû. Erdogan, wekî di dagirkirina Serêkaniyê de, hesab kiribû ku ew ê bi Trump re li hev bike û piştgiriya wan bi dest bix e. Lê, vê carê, rewş guherîbû û daxwazên Erdogan nehatibûn bicîhanîn. Lê, hikûmeta Tirkiyê hewl dan kirin ku desthiladariya HTŞ'ê li dijî Kurdan bikar bîne. Di rastî de jî, polîtîkayên dijî demokrasiyê û desthilatdarîya ku yên HTŞ'ê di şopîne karê Erdogan hêsantir dike. HTŞ naxwaze desthilatdariyê bi kesî re parve bike cûdaxwazî û hevkariyan jî, ji holê radike. Heta roja îro jî, ew bi redkirina tevlîkirina kesî di hikûmetê de desthilatdariyê didomînin. Hikûmeta Tirkiyê radigihîne ku ew ê di bin her şert û mercî de piştgiriyê bide HTŞ'ê. Ew hebûn û statuya Kurdan wekî gefek li ser ewlehiya xwe dibînin û wan wekî xeterî û metirsî nîşan didin. Bandor û serweriya wan a li ser HTŞ'ê rê li ber her goftûgoya ku bi QSD'ê re tê meşandin digire da ku pirsgirêkan aloztir bik in. Di bingeh de, hikûmeta Tirkiyê dixwaze Peymana 10'ê Adarê ne wekî teqezîyekê ji bo çareseriyê, lê wekî hincetekê ji bo şer bikar bîne. Desthiladariya Tirkiyê wisa dibêjê "QSD li gorî Peymana 10'ê Adarê tevnagere, û hikûmeta Şamê neçar dîmîne ku bingeha vebijarka leşkerî amade bike." Li şûna ku navbeynkariyê bike û aligîriya çareseriyê bike, Tirkiye rolekê astengdar dileyiz e. HTŞ, bi piştgirî û hêza ku ji dewleta Tirkiyê digir e, li şûna ku pirsgirêkên wan li ser bingeha entegrasyona demokratîk çareser bike, serweriya yekalî li ser Rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ferz dike.
Ew dixwaze entegrasyonê bi daxwaziya ku Rêveberiya Xweser hebûna xwe bi dawî bike û hemû desthilatên xwe veguhezîne dewletê pêk bîne. Ev jî rasteqîn fermana Tirkiyê ye û hemû daxwazên ku alozîkirina deskeftiyên Kurdan e. Ew bawer nakin ku Kurd hewceyê azadiyê ne, ne jî gelê Sûriyê hewceyê demokrasiyê ne. Azadî û demokrasî di rojeva wan de nîne. Ji bo wan ne girîng e ku pergalek ji Baasê xirabtir hatibe avakirin. Bi rastî, HTŞ daxwaza xwe ya ku avakirina rejîmek yekdest, navendî û dijî demokrasiyê venaşêre. Hişmendiya Erdogan ne pir cuda ye ji HTŞ'ê. Wisa xuya dike ku DYA ji bo danûstandinên nû di navbera QSD û Şamê de hewce dike ku destwerdan bike. Wisa xuya dike ku DYA dixwaze pirsgirêkên li Sûriyê û herêmê werin çareser kirin. Ew ê bi gengaziyekê mezin bala xwe bidin li ser Îran û mijarên din. DYA di danûstandinên di navbera hikûmeta Şam û QSD 'ê de roleke navbeynkar dilîze. Ger bi Şam û Enqerê bê guhdarkirin, ew ê şer li ser QSD û Rêveberiya Xweser ferz bikin. Ji ber vê yekê, ew danûstandinan lez nakin, û xitimandin ava dik in. Pirsgirêka entegrasyonê ne tenê bi QSD ve sînordar e. Pirsgirêkên bingehîn beşdarbûna Rêveberiya Xweser di hikûmetê de, guhertinên di pergala rêveberiyê de, û guhertinên di destûrê de ne. Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk li Tirkiyê jî ji ber Rojava rawestiya ye. Ew dixwazin ku Rêber Apo bang li QSD bike ku çekên xwe deyne. Armanca wan ya bingehîn ew e ku Kurd bi tevahî bêçek û bêparastin bimînin. Girîng e ku ev rastî werin dîtin û hem raya giştî ya navxweyî û hem jî ya navnetewî bi awayekî rast were agahdarkirin.

## Li Ber Deriyê Sedsala Nû: Aşîtî an Kaos?



**Erdogan Altan**

Şerên hegemonyaya cîhanî, jinûve dizayna Rojhilata Navîn û xaçerêya dîrokî ya Tirkiyeyê Dema ku em dikevin meha dawî ya 2025'an, em wekî mirovahî careke din bi heman pirsê re rû bi rû dimînin: Em ber bi ku ve diçin?
Şerê Cîhanê yê Sêyem êdî ne têgehek razber e. Bi awayên asîmetrîk, bi pêvçûnên wekatel ê, bi dorpêçkirinên aborî û bi şerên enformasyonê ji mêj ve dest pê kiriye. Ji Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Duyemîn cûda, ev şer bêyî xêzkirina xetên cepheyê, bêyî ragihandina şer pêş de diçe. Lê tabloya hovîtiyê heman e: Li her derê zarok dimirin, huquqa şer di bin lingan de ye, nirxên mirovahiyê ji holê tên rakirin. Paradoksa bingehîn a sîstema cîhanî ev e: Ne bi çareserkirina pirsgirêkan, lê bi kûrkirina wan li ser lingan dimîne. Krîza avhewayê, xizanî, pêlên koçberiyê, qutubiya civakî... Yek ji wan jî ne wekî "pirsgirêkên ku divê bên çareserkirin" lê wekî "krîzên ku divê bên birêvebirin" têne nirxandin. Manîpulasyon û dezînformasyon tu caran ewqas sofîstîke nebûne. Sûcdarên rastîn têne veşartin, sûcbarên sexte têne afirandin.
Rojhilata Navîn wekî arenaya ku têkoşîna hêza cîhanî herî zêde tê jiyîn û her diçe berdewam dike. Amerîka û hevalbendên wê, di sînordarkirina bandora Rûsya, Îran û Çînê de li herêmê mesafeyek girîng bi rê ve birin. Peymanên Îbrahîmî, ne tenê projeyek korîdora enerjiyê ye; ew çarçoveya stratejîk a avakirina Rojhilata Navîna nû ye.
Mîsyona ku berî sed salan Lozanê hilgirtibû, xuyaye îro li Peymanên Îbrahîmî hatiye barkirin: Nûnersaziya herêmê, ji nû ve damezrandina hevsengiyên hêzê.
Di vê hevkêşeyê de cihê Tirkiyeyê di nîqaşê de ye. Her çend girîngiya wê ya jeostratejîk a berê kêm bûbe jî, derxistina wê bi tevahî ji lîstikê jî ne gengaz xuya dike. Hewldana Washingtonê ji bo lihevhatina Îsraîl-Tirkiye nîşan dide ku Enqera hîn jî aktoreyek e ku tê hesabkirin.
Di nav vê tabloya kaotîk de, yek ji pêşveçûnên herî girîng ên 2025'an li Tirkiyeyê çêbû. Banga aşîtiyê ya Rêber Abdullah Ocalan, biryarên dîrokî yên PKK'ê, şewitandina çekan, vekişîna ji deverên şer... Ev ne gavên piçûk in.
Banga ku di meha Sibatê de hat kirin, biryarên kongreyê, merasîma sembolîk a Tîrmehê... Hemû ev nîşan didin ku aliyek îradeya xwe ya şênber daniye. Gelo bersiv çi bû?
Helwesta desthilatdariya AKP'ê cihê nîqaşê ye. Taktîkên demdirêjkirinê li hember gavên niyeta baş, bersiva têrnekirî li hember gavên pêbaweriyê, gotara israrkar di navkirina pêvajoyê de ("Tirkiyeya Bê Teror") pirsên cidî diafirîne
Serdana komîsyonê ya Îmraliyê wekî nîşana ku pêvajo derbasî qonaxa duyemîn bûye tê şîrovekirin. Lê ji bo ku ev qonax bi tenduristî pêş de biçe hin pêdivî hene:
Ya yekem, beşdariya Rêber Abdullah Ocalan di pêvajoyê de di bin şert û mercên wekhev û azad de. Ya duyemîn, guhertinên şênber di şert û mercên jiyan û xebatê de. Ya sêyem, zelalkirin rola komîsyona meclîsê û diyarkirina çarçoveya pêşniyarên biryarê.
Hewldanên "gotinên ku ne li gor rihê pêvajoyê" yên ku ji niha ve dest pê kirine, dê di rojên pêş de zêde bibin. Gotinên wekê "daxwazên maksîmalîst", bingehek amadekirî ye ji bo redkirina gavên destûrî (makezagonî). Zimanê provokatîf ê hin torên medyayê jî beşek ji vê stratejiyê ye.
Helwesta partiya muxalif (opozîsyona) sereke jî mijareke nîqaşê ya cuda ye. Biryara neçûna Îmraliyê wekî stratejiyek li dijî diyarkeriya AKP'ê tê pêşkêşkirin. Lê eşkere ye ku li pişt vê refleksên netewepere stî hene.
Nêzîkatiya nepejrandina Rêber Abdullah Ocalan wekî muhatab, dibe ku di demkurt de hin beşên hilbijeran razî bike. Lê dîrok, ne yên ku pirsgirêka Kurd ji nedîtî ve tên, yên ku gavên wêrek avêtine dê bi bîr bîne.



# Ji Çiraxên Wêjeya Kurdî

**Can Yûsiv**



Helbestvan Ayşe Sîdî
"Sembola helbesta kurdî ya azad û nebeza dilê jina Efrînî ya berxwedêr".
Helbestvanên jin ên kurd di dewlemendkirina edebiyata kurdî ya nûjen de rolek girîng lîstin, wan gotin ne ji bo nivîsandinê nenivîsandin, lê ji diwêta pênûsên xwe şemslak afirandin ku riyên nasname û çanda kurdî ronî dike û di qada peyvê de dibiriqe di navbera dil û wijdanan de diherike. Helbestên wan ne tenê nivîsar in, lê zindawerin ji henaseyên hestên mirovî yên pak, ji evîna kûr û êşên veşartî , heta hêvî û hewesa nû ya azadî, edalet û wekheviyê.
Helbestvana Kurd Eyşe Şêx Sîdî yek ji wan kesan tê dîtin ku xema peyv û parastina zimanê Kurdî girtiye ser xwe û xîmava pênûsa xwe ji bo xizmetkirina gelê xwe û doza wî terxan kiriye, tîpên xwe kirin fîşek di singa neyaran de û gotinên xwe kirin çirayeke ronak ku rêyên azadiyê pê ronahî dike û di dilan de pertewê rûmet û hêviyê diçîne.
Efrîn... çîrokeke bêdawî ya evînê ye, û dilê Rojava yê Kurdistan ê jîndare û warê zeytûnan ê zindawere ku rehên wê pîr nabin û agirê wê venamire, ew ne tenê xalek li ser nexşeyê ye, lê bîranînek gotindare "axêvere" ku darên wê yên kevnar vedibêjin û şahidiya serdeman dikin û bûyî sîbera bav û kalan , bêhna dîrokê û rastiya têkoşîn, sebir û berxwedanê hildigirin.
Di her şaxekî wê de çîroka welatekî û di her kevirekî wê de şopa şaristaniyekê heye, axa wê şahidiya dîrokên kevnare dike û çiyayên wê çîrokên Med û Sûbariyan vedibêjin û dengên Mîtaniyan û Hûriyan ên ku di vir re derbas bûne hîn vedidin û li ser axa wê stranên jiyanê hiştine .
Li ser vê xaka pîroz, di nav keskaya buxçeyan û bêhna kulîlkan de, û di navenda bajarê ku hê jî zindî bi dan û jiyan û mûzîka kevnar a Kurdî , helbestvana Kurd Eyşe Şêx Sîdî di sala 1987'an de, ji dayîk û bavek Kurd (Ebdul Qadir û Ferîde) di nava malbateke Kurdperwer, neteweyî û oldar de ,girêdayî bi nirxên resen ên kurdewarî ve, ku ji çar xwîşk û du birayan pêk tê hatiye dinyayê .
Bavê wê hezkirina axê û dilsoziya bi welat re di dilên wan de çandibû û ew li ser bîhna çanda kurdî û nasnameya wê ya neteweyî mezin bûn û ji zarokatiya xwe de mîrasek xweparêzî û wefadariyê hilgirtibûn, ku piştre bibin dengek zindî yê nasname û rûmetê.
Li wir, cihê ku erdnîgarî bi dîrokê re, û awaz bi helbestê re hev himbêz dikin, Eyşe dest bi gavên xwe yên pêşîn ber bi nameyê kir, guhê xwe da pistîna xwezayê mîna ku îlhamek esmanî be û helbestên xwe yên yekem ji bêdengiya çiyayan dinivîse.
Zarokatiya xwe di hembêza bajarê Efrînê de, di navbera kolanên wê yên teng û taxên wê yên kevnar de û li ser peravê çemê Efrînê, Gola Meydankî, sulavên Cemrûk û kaniyên Andara û Basûtê derbas kir, ew mîna karxezalekî di navbera çiya û geliyên Efrînê , deşt, zevîyên wê de û di nav bax û bustanên gundê xwe Şêxler Obsî de , li serê Çiyayê Hawarê, ku ezman hembêz dike, mezin bû.
Li feraşînên Efrînê ku çiya bi helbestê digihêje hev û ba destên xwe bi şitlên zeytûnê dihejîne, Ayşe di nava pestînên zeviyan, dengê şivanan û stranên jinan de mezin bû.
Li wir ew hîn di piçûkatiya xwe de hinêra vebû li ser çîrokên dayikên ku ji bo welat, evîn û azadiyê distirandin û destanên qehremaniya bapîran vedigotin , ji stranên kevneşopî û neteweyî yên ku çîrokên evîn, xemgînî û hêviyê vedibêjin, ew fêrî hezkirina welatê xwe bû, û di dilê wê de bû mîna koka dara zeytûnê ku ne hişk dibe û ne jî dişkê.
wê ji axa wê hêzbûna çiyê hilgirt, ji hewaya wê paqijiya awazê û ji jinên wê xweşikbûn û hêza jiyanê wergirt.
Peyv di wijdanê wê de rûnişt, û helbest bû zimanê wê yê yekem ku derbirîna evîna wê, hesret û serhildana ku di giyanê wê de dikele dike.
Ji çavkaniyên çîrokên gelêrî û sirûdên jinan ên li qiraxên çeman, heya dengê cotkaran û bêhna nanê tenûrê, Eyşe helbestên xwe wek efsaneyan vehûnandin, û dengê jinê bilind kir li hember zehmetiyan û mîrateya gelê xwe hildigirt.
Di wê jîngeha dewlemend a bi efsane û çîrokan de, di nav şûnwarên Mîtanî û Hûriyan û perestgehên Medan de, Eyşê ruhê dîroka kûr a Kurda girtiye û helbestên wê bûne neynika bîranîna xakê, li ser hesretê distirîne, navê şehîdan vedibêje û wêneyê jina Kurd wekî sembola paqijî ,hêz û jiyanê ji nû ve diafirîne.
Ji destpêka xwe ve, wê dizanibû ku helbest ne tenê xemilandineke zimanî ye, lê peyameke neteweyî û mirovahî ye û derbirîna nasnameya ku her tim pêrgî hewlên çewisandin û jibîrkirinê tê ,dike ,ji ber vê yekê gotinên wê bi bêhna axê, bi şîrê zeytûnan û bi ruhê berxwedanê yê ku gelê Efrînê cuda dike, tijî bû, nîşan dide .
Ayşe ,di şazdeh saliya xwe de dest bi nivîsandina helbesta bi erebî kiriye, piştre di hejde saliya xwe de derbasî nivîsandina helbesta bi kurdî bûye. Helbestên wê bûne neynika êşa wê ya mirovahî û deng ji dengên jinên Kurd yên berxwedêr.
Wê dest bi rêwîtiya xwe ya xwendinê kir li dibistanên Efrînê heta pola çaran,piştre xwendina xwe ya seretayî, amadehî û navîn li bajarê Helebê berdewam kir û di sala 2010'an de bawernameya xwe ya bekeloryayê wergirt.
Piştî destpêkirina Şoreşa Rojavayê Kurdistanê, ew tevî malbata xwe vegeriya bajarê xwe Efrînê ,da ku perwerdeya xwe li Peymangega Zimanê Kurdî bidomîne, û di sala 2013'an wê bawernameya zimanê kurdî wergirt , di pêngavekê de ku girêdana xwe ya zimanî û çandî bi rehên xwe yên netewî re xurt kir, û peyv kir amûra xwe ji bo parastina nasnameya Kurdî ji tunekirin û jibîrkirinê.
Ew li wir ma, mamostetî dikir, dinivîsand û stran digot ji bo Efrînê , heya roja reş hat ,roja ku bajar ji aliyê artêşa Tirk û çeteyên wê ve hate dagirkirin, wê rojê taybetiyên xakê guherand û di canê wê de birînek kûr hişt ku qet qemûş nagire , lê di dilê wê de agirê israrbûna vegerê, nivîsandinê û berxwedana bi gotinê qet venemirand.
Helbestvan Eyşe bi zimanên Kurdî û Erebî dinivîse û bi şêwazeke taybet û cihêreng di nivîsandina helbestên nûjen, azad û pexşan de, ew hevrêzîyê dike di navbera şarezayî û bedewiya hunerî de û kûrahiya ezmûna xwe ya mirovahî û netewî tîne ziman, gotinên wê mîna bayê sibehê nerm in , giyan şa dikin, birînan derman dikin, û bê destûr diherikin nava dilan ji ber dilpakiya hest û germahiya wateyê ku hildigirin.
Ew helbestên xwe bi dengekî pir xweş û şêrîn , melûl û bi hesret dixwîne, da ku helbestê bike pirek di navbera mirov û welatê wî û di navbera peyv û wijdanê de û serpêhatiya helbestê vediguherîne strana hesretê , nasname û bîranînek zindî.
Dîwaneke wê ya helbestan bi zimanê kurdî heye ku li benda çapê ye, helbestên herî diyar tê de:

1- Efrîna Min
2- Îşev
3- Mirna Hêdî
4- Êşa Pênûsê
5- Cana Min
6- Gilî
7- Xatirê Dawî
8- Bûka Kurdistan

Ew helbesta nûjen, azad bi bi zimanê Erebî ê petî û bi şêwazek bedew û hêja dinivîsîne, ku hevrêziyê dike di navbera kûrahî û zelaliyê de,û êşê veguhêrîne bedewî yê, û hesretê dike awazek ku di wijdanê de bimîne.
Her wiha dîwaneke wê ya helbestan a bi zimanê Erebî jî heye, ku nêrîna wê ya hunerî û hestyarî vedihewîne.
Ji helbestên wê yên herî navdar:

1- Ey mirov
2- Biryar
3- Şahbanûya can
4- Ez keçeke Efrînî me
5- Sûcdarkirin
6- Pistîna payîzê
7- Ez û Xweda
8- Ez bi tenê me


Her helbestek ji van berheman nîşaneke xwe ya taybet dide, nalîna erdê, dengê jinan û êşa sirgûnê tevlihev dike, lewra serpêhatiya Eyşê ya helbestvanî dibe neynika Efrînê ya ku kûve diçe di dilê wê de dimîne û dibe hawara evîn û dilsoziya bi welatekî ku ji bîrdankê dernakeve.
Ew dinivîse ji ber ku bawer dike ku helbest welatekî din e ku nayê dagirkirin,dema ku jina kurd dinivîse, bîrdanka miletekî tevahî ji bîrnebûnê rizgar dike.
Şarezayiya helbestvan Eyşe tenê bi nivîsandina helbestê sînordar nema, gihişte warê lêkolînên ramyarî û rewşenbîrî û nivîsa wêjeyî ya dahûranî "Tehlîlî" bi zimanên Kurdî û Erebî ,ji lêkolînên wê yên analîtîk ên herî navdar:

1- Dema bêdengiyê.
2- Mirov û mirovahî .
3- Xwe nas bike.
4- Lêgerîna li rastiyê.

Van berheman hewesa wê ya ji bo zanînê, û şiyana wê ya ku dikare êşê veguhêrîne ramanek ronahî û gotnek ku li hemberê jibîrkirinê berxwe bide radixe ber çavan.
Tevî tûndiya şer, ku nehişt berhemên wê bên çapkirin jî, wê bi rêya kovar, malper û platformên medyaya civakî karî wan bighîne civakê .
Berhemên wê di gelek kovaran de hatine weşandin, mîna
Kovara :(Tîrêjên Rojê,Avaşîn,Konê Wêje li Rojava, Pêşkevtina Pênûsê, Asoyên Jinan li Şehbayê, Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Firatê).
Her wiha di rêwîtiya xwe ya wêjeyî de ji şêwaz û edakirina helbestvanê kurd Ferhadê Mêrdê bandor bûye û ji serpêhatiya wî ruhê helbesta nûjen, azad û pexşanî girtiye.
Wê gelek bawernameyên rêzgirtinê ji aliyên çandî û wêjeyî yên cuda wergirtin ,ji kovarên mîna:( Avaşîn,Konê Wêje li Rojava, Tîrêjên Rojê). Ew beşdarî gelek şevbuhêrkên wêjeyî yên li bajarên Rojava bû, da ku bibe dengek wêjeyî ya heyî di dîmena çandî ya kurdî de, tevî koçberî û derbidebûnê.
Piştî dagirkirina Efrînê di sala 2018'an de ew, koçberî Şehbayê bû û ji wir jî koçberî Tebqayê bû ku niha lê dimîne , ew li wir dersên zimanê Kurdî dide û nivîsandina helbest, gotar û lêkolînan bi zimanên Kurdî û Erebî berdewam dike û tekez dike ku peyv dê bimîne welatekî ku nayê dagîrkirin, û helbest pireke di navbera bîrdank û paşerojê de.
Helbestvan Eyşe yek ji wan dengên jinên Kurd tê hesibandin ku kariye hevrêzîyê bike di navbera pabendiya neteweyî û kûrahiya mirovahî de di ezmûna xwe ya wêjeyî de .
Tevî dijwariya jiyanê û koçkirina wê ya bi darê zorê ji Efrînê, bajarê ku jê hez dikir û bîranînên wê di helbestên xwe de xêz dikir, û jiyana wê ya çend salan li kampên Şehbayê di bin şert û mercên dijwar de ku dilê mirovan di sojandin û hêsir ji çavan di barandin,lê ew pêdar ma mîna dara sindiyanê di rûyê bahozan de , ti bayê xurt nekarî wê bişkîne, û wê ji evîna peyvê , ji armanca ku di dilê wê de bûyî nebezek û ji giyanê wê re bûyî penagehek dûr bêxe.
Ew trajedî û serpêhatî bûne çavkaniyek ji bo hûnandina peyvan û êzingek zêde ku riya pênûsa wê ronî dike. Ji nav tîpan xem û kederên wê derdiketin, gotin wek awazan diherikîn û helbest ji bo jiyan û hêviyê di qêrîn û ji êşa sirgûnê tîrêjeka sebir û israrê vedihûnê.
Wê bi dengekî bilind bang dikir ku kolan û bîranîn ji vedenga wê dilerizyan û di got:
Em li vir in... em li ser axa bav û kalên xwe dimînin û em jê nagerin ... û em ê di demek nêzîk de vegerin Efrînê, da ku careke din evîn û azadiyê li ser axa welatê xwe yê hêja biçînin."
Ji wê re serkeftin û afirîneriya zêdetir dixwazim.

## Têbînî

### Gelo Jîriya Çêkirî dikare wêjeyê biafirîne



**Kemal Necim**

Di demên dawî de, mijara nivîsên wêjeyê yên bi rêya Jîriya Çêkirî (AI) hatine çêkirin ketiye rojeva derdorên wêjevan û nivîskarên kurd. Tê gotin ku beşek nivîskaran êdî nivîsên xwe yên wêjeyî bi taybet, helbest, çîrok û romanan bi rê û alîkariya platformên Jîriya Çêkirî çêdikin.
Ji bilî arîşe û pirgirêka ramyarî û exlaqî ya vê rûdanê, gelek pirsên din derdikevin holê, ka gelo bira Jîriya Çêkirî dikare deqên wêjeyî yên nêzî hestên mirovî biafirîne?.
Li gorî hin zanyaran mijara dahênanê û afrêneriya nivîskî mijarek felsefî ye, ji ber çaxê ku mirovek deqekê diafirîne, ew dengê xwe yê wêjeyî û ezmûna xwe ya jiyanê bikar tîne, lewma ew deqa ku diafirîne dibe afrêneriya hişê mirovan. Nivîsîn ne tenê rêzkirina peyvan û wateyan e, nivîsîn derbirîna ezmûna mirovî ye. Angot mirov êşên xwe, pirsên xwe dike wate. Mirov dêşe, xeyal dike, kêfxweş dibe û dikare van hestên mirovî veguherîne wateyan û bike deqeke wêjeyî. Lê ev hestên mirovî li ba makîneyan tune ye, ji xwe Jîriya Çêkirî makîne ye, ew makîne hatiye tijekirin, agahî û peyv xistine bîrdanka wê de, ew jî li gorî agahiyên ku jê re hatine dayin, dixwaze tiştên nêzî yên mirov diafirînin, biafirîne.
Bê guman, di asta heyî de Jîriya Çêkirî dikare deqên bi bandor çêdike, di demeke pir kurt de dikare bi sedan deqan çêbike û agahiyan rêz bike, lê tiştek bê hiş û raman e, ew tenê tiştên ku jêre hatine gotin û li ser hatiye perwerdekirin dibêje û çêdike, ew nikare bifikire û derbarê mijarên felsefî yên derûniya mirovan de pirsan bike û bersivan bide.
Lewma di warê wêjeyê de her nivîseke ku bi alîkariya Jîriya Çêkirî hatiye çêkirin, mirov nikare navê afrandinê lê bike, ew tenê dibe deqeke çêkirî ya bê hest.
Ev arîşe û pirsgirêka exlaqî niha li gelek deverên cîanê bûye mijara gotûbêjan. Sala derbasbûyî romannivîsa Japonî Rei Kodan li ser romana xwe ya bi navê "Burca Tokyo ya Hevkariyê" xelateke wêjeyî wergirt. romannivîsê di axaftina xwe ya dema wergirtina xelatê de diyar kir ku wê roman bi alîakriya bernameya Jîriya Çêkirî CHAT GPT nivîsandiye, ev yek bû sedem ku hin xwendevanên Japonî xelata wê wekî "Diziya Wêjeyî" bi nav bikin. Heman tişt li hin deverên din pêk hat.
Di rewşa wêjeya Kurdî de, ji xwe berê gelek pirsgirêk û arîşe hene. Heta hina qadeke tekûz ya rexnegiriya wêjeyî di nav kurdan de nehatiye avakirin, lewma heta niha deqên wêjeyî yê kurdî baş nehatine lêkolînkirin û rexnekirin. Ji ber vê yekê, salane gelek berhemên wêjeyê yên lawaz û qels dikevin bazara pirtûkan.
Niha jî eger ev qada lêkolîn û rexnegiriyê pêşnekeve, eger rexnegiryeke pirspor nekeve qada wêjeya kurdî de, dê rûdaneke hîn xerbtir derkeve. Dê rojane bi dehan deqên çêkirî, yên dûrî hest û raman û afrênerya mirovî derkevin û li nava civakê belav bibin.
Pir girîng e ku saziyên têkildar bi baldarî gun bidin qada rexneya wêjeyî, li zanîngehan û akademiyan vê mijarê bikin rêbaza pwerwerdeyê û kesên ku di vê mijarê de pirspor in, yan dikarin di dema pêş de bibin pispor piştgirî bikin.

# Yekîtiya Esnafan pira di navbera welatî û rêveberiyê de ye

Hevserokê Yekîtiya Esnafan Nizhan Mehmûd diyar kir ku armanca wan ew e ku yekîtî bibe pireke di navbera rêveberiyê û welatiyan de û got: "Armanca me ku em karibin daxwaz û nêrînên welatiyan raghînin rêveberiyê, di heman demê de jî dengê rêveberiyê û rêxistinbûnê bighînin welatiyan."

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Bi armanca rêxistinkirina kar û xebatên bazaran li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di sala 2019`an de Yekîtiya Esnafan li bajarê Qamişlo hat damezrandin. Ji wê demê heya niha yekîtiyê gelek kar û xebat dan meşandin weke beşek ji Odeya Bazirganiyê. Bi derbasbûna demê re biryar hate dayîn ku sîstemeke hundirîn ji bo yekîtiyê bê nivîsandin û weke yekîtiyeke serbixwe kar û xebatê xwe berdewam bike, lewma di 5'ê Mijdarê de Konferansa damezirîner a Yekîtiya Esnafan bi drûşmeya "Bi rêxistinkirina bazara civakî em civakeke demokratîk û azad ava bikin" li bajarê Hesekê yê kantona Cizîrê, di gaveke de ji bo rêxistbûna bazarên herêmî û xurtkirina aboriya civakî; hat lidarxistin.

Di konferansê de Nizhan Mehmûd û Fîkret Xelîl Abdo weke hevserokê yekîtiyê hatin hilbijartin li gel hilbijartina 10 endamên ji bo meclisa



giştî ya yekîtiyê.

Derbarê kar, xebat û armancên yekîtiyê hevserokê Yekîtiya Esnafan Nizhan Mehmûd ji rojnameya me re axivî.

Hevserokê Yekîtiya Esnafan Nizhan Xelîl di destpêka axaftina xwe de bal kişand li ser konferansa wan a damezrîner û wiha got: "Berê weke Esnaf em girêdayî Odeya Bazirganiyê bûn, lê bi derbasbûna demê re her du ji hev cuda bûn û esnaf bû yekîtiyek serbixwe, lê bêyî tu konferans an jî kongir kar û xebatê xwe dimeşand, li ser vê bingehê biyara hat dayîn ku sîstema hundirîn a yekîtiyê bê nivîsandin di heman demê de konferan bên li dar xistin li ser asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di konferansê de li ser sîstema hundirîn, hevserokatiya giştî, hevserokên kantonan, meclisa giştî û logoya yekîtiyê bi awayekî giştî hat erê kirin. Nivîsgehên yekîtiyê li kantona Tebqa, Kobanê, Reqa, Dêra Zorê û Cizîrê hene. Di konferansê de tekezî hat kirin li ser xurtkirina rola jin û ciwanan di aliyê aborî de bi taybet di nava esnafan de. Weke sîstem bajarên ku girêdayê kantona Cizîrê 11 bajarin wek (Şedadê, Til Temir, Dirbêsiy, Amûdê, Tirk Birak, Til Koçer, Dêrik, Girkê Legê, Tirbespiyê û Qamişlo). Niha em nivîsgeke nû li bajarê Çil Axa jî vebikin."

**Kar, xebat û armancên yekîtiyê**

Nizhan Mehmûd di gotina xwe de li bal kişand li ser kar û xebatên yekîtiyê û wiha berdewam kir: "Kar û xebatên me ji bajarekê ji bo bajarekî din cuda ye, li gorî



esnafan hin bajar hene 40 esnaf hene û hin bajar 20 an jî 25'in, weke yekîtiyên Tirimbêlan, dikanên cilan, dikanên elktronîkan, telîfon herwiha hemû cûreyên bazirganiyê yên di bazaran de."

Hevserokê Yekîtiya Esnafan Nizhan Mehmûd wiha gotina xwe qedand: "Armanca me ku ew e rêxistinkirina aboriya civakî ji ber ku rêxistinbûna bingha her tiştî ye û sedema avabûna yekîtiyê ye herwiha Yekîtiya Esnafan bibe pireke di navbera welatî û rêveberiyê de, di riya komîteyên di nava yekîtiyê de deng û rêxistinbûna ku rêvberî dixwaze bighîne milet di heman demê de pirsgirêk, nerîn, daxwaz û zehmetiyên ku milet dikşînin bihînin aliyên rêveberiyê. Di yekîtiyê de komîteyên çareseriyê hene roleke wê mezin heye di çareserkirina pirsgirêkên ku derdikevin."

# Kargeha ziwakirina garis li Reqayê ketiye xizmetê

**Jîn Hisên/Reqa**

**Hevserokê Meclisa Aborî û Çandiniyê ya Kantona Reqa Fadil Mustefa diyar kir ku armanca xebitandina kargeha ziwakirina garis ji bo xizmeta cotkaran e wiha got: "Em dixwazin barê cotkaran sivik bikin û berhema garis ji xirabbûnê biparêzin."**

Kargeha ziwakirina garisê a li Reqayê 18'ê Cotmeha 2020'an hatibû xebitandin, lê piştre hat sekinandin û tenê salekê kar kir. Ji wê salê ve Rêveberiya Xweser êdî garisê zer ji cotkaran wernegirtiye. Desteya Aborî û Çandiniyê ya Kantona Reqayê destpêka meha Mijdarê ragihand ku wan kargeha ziwakirina garisê zer xistiye xizmetê.

Ber bi avêtina gavên erênî di aliyê çandiniyê de, li kantona Reqayê bi armanca xizmetkirina cotkaran û hêsankirina barê wan yên zeviyên çandiniyê, jinûve vekirina kargeha ziwakirina garis gaveke giring bû ji bo parastina garisê zer ji



xirabbûnê dûrî şêwazên kevneşop û qezayên ku li ser rê çêdibin di heman demê de xeteriyên girêdayî wê. Ev gav dê rê li ber zirarên ku dibe bigihêjin zeviyan bigire di heman demê de zeviyan ji dizî û talanê biparêze.

Derbarê vekirina kargeha ziwakirina garisê zer Hevserokê Meclisa Aborî û Çandiniyê ya Herêma Reqa Fadil Mustefa ji rojnameya me re axivî.

**"Kargeha ziwakirinê dê zirarên ku dibe bigihêjin zeviyan bigire"**

Hevserokê Meclisa Aborî û Çandiniyê ya Reqa Fadil Mustefa di destpêka axaftina xwe de tekez kir ku vekirina kargeha ziwakirina garsê zer gelek pirsgirêkên ku cotkaran êş jê dikşandin derbas kir û wiha berdewam kir: "Berê cotkarên garisên zer berhemên xwe bi şêwazên kevin ziwadkirin weke raxistina li ser rêyan, vê yekê gelek pirsgirêk bi xwe re dianî, weke çêbûna qezayên li ser rê dibû sedem ku zirar bighêje berhemên cotkaran herwiha nakûkî di navbera cotkaran derdiket li ser cihên raxistina wê. Rêbazên kevin ê ziwakirina garis demên dirêj dixwest da ku garis ziwa bibe ku dighaşt 3 heta 4 rojan, gelek caran ji ber guhertina rewşa hewayî û barîna baranê bandorê dikir. kargeha ziwakirina garisê Zer dê rê bigre li ber zirarên ku dibe ku bighêje zeviyan.

**'Kargeh bi sê depoyan tê xebitandin'**

Hevserokê Meclisa Aborî û Çandiniyê ya Herêma Reqa Fadil Mustefa behsa mekenîzmeya xebitandina kargehê kir û wiha anî ziman: "Kargeha ziwakirina garis ji sê depoyên Fransî pêk tê, her depoyeke ji 160 heta 170 ton garis ziwa dike. Eger 24 seatan kargeh bixebite dê her depoyek 200ton garis ziwa bike. Ji xwe dema seatên xebitandina kargehê li gorî hewcdariyê tê xebitandin. Ziwakirina garis di kargehê de her 40 ton 5 saetan dewam dike. Buhaya her tonekê bi 12 dolaran tê ziwakirin tevî rakirina di kîsan de û dirûtina wê, ev buha li beramberî ziwakirina bi rêbazên kevn kêm e."

Hevserokê Meclisa Aborî û Çandiniyê ya Herêma Reqa Fadil Mustefa wiha axaftina xwe qedand: "Rêjeya şilbûna garis dema dighêje me 40% ye, lê dema ku tê ziwakirin em bi rêjeya 14% radestê cotkaran dikin, ku rêjeya herî guncave di seranserî cîhanê de, bi vê rêjeyê dibe ku heta 6 mehan jî garis bê veşartin bêyî ku xirab bibe."

Hêjayî gotinê ku buhaya her toneke garisê zer niha dighêje 200 heta 230 dolarê Amerîkî.





# 'Di hevsengiya Sûriyê de hemû alî dixwazin giraniya xwe çêkin'

Rojnamevan Mansur Adali diyar kir ku hîn di pêla destpêkê ya serhildanên demokratîk ên gelên Sûriyê de rejîma Baas têk çûbû, lê ji aliyê hin hêzan ve li ser piyan hatibû hiştin, gel jî li bendê bû ku li şûna wê rejîmekî demokratîk a ku maf û îrada siyasî nas bike, were avakirin û got, "Colanî wekî kabûsekî li ser xewn û xeyalên pêkhateyên Sûriyê rûnişt."

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê giştî rewşa Sûriyê, bi taybetî guhertin û veguhertinên ku ji dema hatina hikumeta veguhêz li ser desthilatdariyê pêk hatine, rojnamevan Mansur Adali bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Di 8'ê kanûna 2024'an de guhertineke ku ne di xeyalên gelên Sûriyê de bû, li Sûriyê pêk hat, ev guhertin bi çi rengî bû û gelên Sûriyê ev guhertin çawa girtin dest?**

Di bingeh de pêla geşedanên ku bi 'Bihara Gelan' re li Rojhiata Navîn dest pê kir, bandora xwe li ser Sûriyê jî kiribû; ango guhertina Sûriyê bi 'Bihara Gelan' re dest pê kiribû. Her kes li bendê bû ku di Sûriyê de jî rejîma Baas a şoven, rejîma ku mafên demokratîk û siyasî yên gelên Sûriyê nas nake, di encama helwesta demokratîk a gelen Sûriyê de were guhertin. Li şûna wê rejîmekî demokratîk a ku mafên hemû gel û pêkhateyên Sûriyê û îrada siyasî ya gelên Sûriyê nas bike, were avakirin. Lê di encama destwerdana hêzên statûkoparêz ên herêmê û hêzên kapîtalîst yên kûrewî de ev guhertin gelek caran ji xeta xwe ya demokratîk hate dûrxistin û vê yeke êşên pir giran bi gelên Sûriyê da jiyankirin. Heger em werin rastiyê, rejîma Baas a ku bi desthilatdariya Esed ve dihate rêvebirin, hîn di pêla destpêkê ya serhildanên demokratîk ên gel û pêkhateyên Sûriyê de, têk çûbû û hilweşiya bû. Lê ji aliyê hêzên navnetewî yên ku dixwestin li Rojhilata Navîn hegomonyaya xwe bi ser bixin û di encama hevsengiyên siyasî û leşkerî yên navnetewî û herêmê de li ser piyan dihate hiştin. Hêzên sereke yên ku rejîma Esed li ser piya dihiştin jî, Îran û Rûsya bûn. Lê bi guhertina vê hevsengiyê re rejîma Esed nekarî xwe li ser piyan bigirta û di demekî pir kurt de bi awayekî fiîlî jî têk çû. Di dewsa rejîma Baas de bi pêşengiya Colanî û HTŞ'ê rejîmekî 'nû' kontrola Şamê xis-



te destê xwe û ev di demekî pir kurt de, pêk hat. Ango di 8 rojan de pêk hat û li beramberî vê hêzê berxwedaniyekî ciddî nehat jiyankirin. Wateya vê çi bû? A yekê; ev tê wê wateyê ku ev hêz ji aliyê hin derdoran ve di demekî dirêj de dihate amadekirin. A duyemîn û herî girîng jî ew bû ku ew kêliya hevsengiyên rejîma Baas li ser linga dihiştin dema ku ji pişta Esad vekişiyan, rejîma Baas nekarî li ber xwe bide û di cih de têk çû.

Em dikarin bêjin ku hemû xeyal û hewildanên gelên Sûriyê ji bo guhertna rejîma Baas a heyî bû. Di destpêkê de ji ber ku ev xeyala wan pêk hat û rejîma Baas hilweşiya, kêfxweşiya xwe raber kirin û vê pîroz kirin. Gelên Sûriyê dîtin ku ew êşên bi salan e kişandibûn û ew berdêlên ku ji bo guhertina rejîmê dabûn ne vala bûn û hilweşîna rejîma Baas di encama berxwedaniya wan a mezin de pêk hat. Lê gotinek dibêje; "Dema ji ber baranê direve, rastî teyrokê hat''. Gel û pêkhateyên Sûriyê vê yekê haq nekiribûn. Pêwist bû ku xeyala wan a Sûriyekî demokratîk û mafên hemû pêkhateyan bi awayekî siyasî û îradî di destûrê de were misogerkirin, bihata damezrandin. Lê ev pêk nehat. Colanî weke kabûsekî li ser xewn û xeyalên gel û pêkhateyên Sûriyê rûnişt. Lê divê ev tim jî di bîra hemû aliyan de be, bi taybet jî di bîra gel û pêkhateyên ku Sûriyekî demokratîk dixwaze de be ku rejîma Colanî wekî planekî hêzên kûrewî ye û bi piştgiriya van hêzan ev nêzî salek ê Şam xistiye bin kontrola xwe û hîn jî li tevahiya Sûriyê wekî rejîmekî ku nayê xwestin e. Ango ew jî wekî Esed bi piştgiriya hevsengiyên navnetewî li ser piyan tê hiştin û heger bi rastî jî li gorî xwen û xeyalên gel û pêkhateyên Sûriyê yên demokratîk û azadîxwaz tevnegere, wê aqûbeta wî jî ji ya Esed cûdatir nebe û wê bi qasî Esed jî nikaribe xwe li ser lingan bigire. Lewma jî lazime têkoşîna demokratîkkirina Sûriyê û azadiyê bi hevgirtina hemû alî û pêkhateyan ve hîn bi awayî xûrttir û bi rêbazên têkoşînê yên xuliqdar û dewlemendtir were meşandin.

**Ji dema hatina HTŞ'ê li ser desthilatê û heya niha çi guhertin û veguhertin li Sûriyê pêk anî û ev guhertin xwedî bandoreke çawa bû?**

Li ser HTŞ'ê û Colanî pir tişt hatin gotin û nivîsandin, ango him wekî kesayet Colanî û him jî wekî rêxistinekî terorî HTŞ'ê ji aliyê raya giştî ve têne naskirin. Ji bo wê ne hewceye ku em dûbare qala wan ku ev kî ne û kiryarên wan yên berê çine, bikin. Radestkirina Şamê ya ji Colanî û HTŞ'ê re wekî planekî hêzên kûrewî pêk hat ku pêşengtiya wê ya stratejik Îngilîstan û Emerîka dike, lê li ser erdê pratîzekirina vê planê ji aliyê Îsraîlê ve tê pêkanîn.

Gava yekemîn a vê planê ku wekî destpêkirina şerê cîhanê yê 3'yemîn jî tê pênasekirin, di dîroka 2'ê Tebaxa 1990'î de, di dema ku Kûweyt ji aliyê Seddam Hûseyîn ve hate dagirkirin, hate avêtin. Destpêkê berê Seddam dane Kûweytê, piştre jî vê kirin hincet û mûdaxeleya li ser Rojhilata Navîn dan destpêkirin û ev yek heta bû sedem ku serê Seddam Hûseyîn jî biçe. Rejîma Sovyetê ji ber sedemên hundirîn hilweşiyabû û hevsengiya cîhanî ya ku li ser du blokan hatibû rûnişkandin, xera bûbû. Vê jî pêwîstiya bi plansaziyekî nû ya ji bo parastina pergala sermaya kûrewî derdixist holê. Ev pêngav bi gelek pêngavên li pey hevdû yên taktîkî û stratejîk ên cûda ve, kete meriyetê û heta roja me ya îro hat. Anîna Colanî û HTŞ'ê ya Şamê jî pêwîst e bi vê rastiyê ve, girêdayî were destgitin. Em dikarin çend mînakên dîrokî bidin. Yek ji pêngavên ku herî zêde herêma me bandor kir, komploya navnetewî ya ku li dijî Rêber APO pêk hatibû. Piştî wê êrişa 11'ê Îlona sala 2001'î ya ku li Emerîka pêk hat, bû wekî hincetekî ku DYA bêhtir xwe di Rojhilata Navîn de bi cih bike. Dîsa pêşketina DAIŞ'ê û kiryarên wî yên terorîstî rê vekir ku DYA vê plana xwe gavekî din pêşdetir bibe. Herî dawî bersiva van hêzên hegomon a li dijî serweriya Îranê ya herêmê û xeteriya wî ya li dijî vê planê, sûîkasta li dijî Qasim Sileymanî pêk hat. Herwiha bi provokasyona Hamasê ya bi navê Tûfana Aksa ku li dijî Îsraîlê pêk hat ve, ev pêvajo derbasî merhaleyekî nû bû. Ji aliyê din ve serweriya Rûsya ya li herêmê jî bi şerê Ukrayna ve hate lewazkirin.

Li kêleka van pêngavên hêzên kûrewî, gelên herêmê her tim li ser piyan bû û ji bo înşakirina pergalekî demokratîk di nava têkoşînê de bûn û xwe bi rêxistin dikirin. Herwiha li dijî vê pêngava kûrewî ya sermaya global pêngavên Rêber APO yên di asta kûrewî de pêş ketin û bi projeya netewa demokratîk û paradigmaya civaka demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinê li ser hemû derdorên demokratîk bandorekî mezin çêkir.

Bi serweriya HTŞ'ê û Colanî ya li Şamê re hevsengiyên herêmê carekî din guherîn. Bandora Îranê û Rûsya ya li ser herêmê hate şikandin û Îsraîl cihê xwe yê stratejîk hîn saxlemtir kir. Ango Îsraîl bû hêza sereke ya ku van planên sermaya kûrewî û pergala modernîteya kapîtalîst li Rojhilata Navîn serwer bike. Vê yeke asta stratejîk a dewleta Tirkiyê ya li Rojhilata Navîn hejand û bû sedem ku girîngiya xwe ya stratejîk a li herêmê lewaz bibe. Ango li Sûriyê hevsengiyên leşkerî û siyasî yên nû pêk hatin û di vê hevsengiyê de hemû alî dixwazin giraniya xwe çêkin. Di rewşa heyî de Rûsya di nava hewildana ku carekî din li Sûriyê qada xwe berfireh bike, de ye. Xeyala Îranê a Hîlala Şîî şikestinekî mezin xwar û wekî berê eşkere nebe jî li qadê tevdigera xwe berdewam dike. Rewşa dagirkeriya Tirkiyê ya li ser axa Sûriyê bi awayekî ciddî di nîqaşê de ye û ev mijar her ku biçe wê bêhtir bikeve nîqaşê. Ji aliyê dîtir ve destwerdanên dewletên Areb berdewam dikin. Çîn bi reqabeta bazirganî hewl dide di lehê xwe de li ser hevsengiyan bandora xwe çêke.

Lê belê rexmê van hemû geşedanên tên jiyankirin, têkoşîn, berxwedan û xwerêxistinkirina gel û pêkhateyên Sûriyê yên demokratîk jî berdewam kir. Gel û pêkhateyên Sûriyê dev ji doza xwe ya demokratîkkirina Sûriyê û înşakirina Komara Demokratîk a Sûriyê bernade. Hêzên Sûriyê rexmî hemû êrişên terorî û kiryarên der mirovî, komkujî û qirkirinan, hêza xwe ya demokratîk parast û bandora xwe zêdetir kir. Li beramber pêngava kûrewî ya modernîteya kapîtalîst, Rêber APO jî pêngava Aştî û Civaka Demokratîk bi manîfestoyekî ji raya giştî re ragihand û gel û pêkhateyên Sûriyê ji vê pêngavê hêzekî mezin girt. Bû xwedî perspektîfekî nû yê têkoşîn û xwe bi rêxistinkirinê. Di wateya giştî de heger em qala guhertinên dawî bikin em dikarin vana bêjin.



# Hevserokê KNK’ê: Li hemberî geşedanan hevrêziya Kurdî qels dimîne ’

Hevserokê KNK’ê Ehmet Karamus da zanîn ku li Rojhilata Navîn guhertinên bi lez çêdibin, çendî hewldanên yekrêziyê baştir bin ji demên berê jî, lê dîsa qels dimîne li hemberî geşedanên siyasî û got, “Derfeta tevgera Kurdî heye, dem hatiye ku xwedî projeyeke istratejîk a hevbeş bin ji bo parastina destkeftiyên niştîmanî.”

**Hemza Sêvo**

Di nava guhertinên ku li Rojhilata Navîn bi taybet ku li Sûriyê pêktên, yekrêziya Kurdî mijareke pir girîng e. Ev mijar bi rûxandina rêjîma Baas li Rojavayê Kurdistanê re kete rojevê, xebata ji bo yekrêziya partiyên Kurdî bi hewldanên Kurdistanî hatin destpêkirin ta ku di 26’ê Nîsanê de li Qamişlo Konferansa Yekhelwestiya Kurdî bi beşdariya partiyên Kurdistanî hat lidarxistin. Piştî vê gavê pêla hevdîtin, civîn û diyalogê di navbera partiyên Kurdî li her çar parçeyên welat bilind bû, di roja îro de ev diyalog û lihevkirin li hemberî geşedanên Rojhilata Navîn rû bi rû maye. Derbarê heman mijarê de Hevserokê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Ehmet Karamus ji rojnameya me re axivî.

**‘Dewleta Tirk ji bo çareserkirna pirsa Kurdî bi neyînî nêz nabe’**

Ehmet Karamus destnîşan kir ku dewleta Tirk bi neyînî nêzî tevgera Kurdî dibe û wiha got: “Rewşa Rojhilata Navîn, ji ber pêkanîna projeyên siyasî ne diyar e, berjewendî û siyaseta ku li vê herêmê dem bi dem tên guhertin. Me nerî ku çawa Israîl bi hevkariya Amerîka, Tirkiyê, dewletên Ereban û hin dewletên Rojavayî pilanek ji bo pirsa Filestînê dest pê kir. Heta niha aramiyeke siyasî li seranserî herêmê hîna jî nehatiye peydakirin. Tu kes nizane ku wê pêvajoya guhertina herêmê çawa be û tu kes nikare analîz û texmînan bike ku wê rewş ber bi ku ve here. Tişta herî girîng guhertina helwesta Amerîka li hemberî hikumeta veguhêz a Sûriyê ye. Hewldana Amerîk ji bo bidestxistina ewlehiya siyasî rewşeke nû derdikeve holê, rewşa nû jî tevlîbûna hikumeta veguhêz bi serpereştiya HTŞ’ê ji keoalisyona navdewletî ji bo şerê li dijî DAIŞ’ê ye, gelo bi vê yekê wê çiqasî bandore li rola QSD’ê di şerê DAIŞ’ê û nava keoalisyonê bike. Herwiha wê çiqasî ev tevlîbûn wê badorê li siyaseta Tirkiyê û destewerdana wê li Sûriyê bike, hem jî wê dewleta Tirk derfetê bide ku pirsgirêka Sûriyê çareser bibe. Di dema heyî de dewleta Tirk aliyê herî xerab e di derxistina astengiyan li pêşiya çareseriyên tevahiya Sûriyê de. Bi taybet çareserkirina pirsgirêka gelê Kurd li Rojava, siyaseta dewleta Tirk ji bo wê, mirov nikare bi erênî binirxîne. Dewleta Tirk li benda derfetekê ye ku li tevahiya Kurdistanê tevgera Kurdî tesfiye bike.”

**‘Hevrêziya tevgera Kurdî dîsa qels dimîne li hemberî geşedanên siyasî’**

Karamus anî ziman ku çendî hevrêziya partiyên Kurdî ji berê baştir be jî, lê dîsa qels dimîne li ber rewşa siyasî ya bi lez tê guhertin û wiha domand: “Bê guman nêzkatî û diyalog di navbera Kurdan de di roja îro de bi gelekî baştir e ji rewşa berî salekê. Li seranserî çar parçeyên Kurdistanê hevdîtin û lihevkirina tevgera Kurdî li gorî salên bûrî bi gelekî çêtir û cûdatir e. Lê li gorî geşedan û rewşa ku Rojhilata Navîn herwiha siyaseta ku li vê herêmê tê meşandin, nêzîkatiyên Partiyên Kurdistanî ji hev re ne li gorî xwesteka KNK’ê ye. Kongreya Netewiya Kurdistan daxwaza wê ew e ku partiyên Kurdî bi leztir û li gorî pêvajoya ku Rojhilata Navîn bicivin û hevrêziyekê ava bikin. Geşedanên siyasî yên bi lez ku li herêmê pêktê û bandorê li tevahiya Kurdistanê dike, pêwîstî heye ku partiyên Kurdan li gorî van guherînan tevbigerin, nêzî hev bibin û yekhelwestiyeke xwe pêk bînin. Wekî tê zanîn ev saleke ku pêvajoyek ji milê Rêber Apo ve hatiye destpêkirin, li ser daxwaza wî jî nêzîkatî di navbera birêz Mezlûm Ebdî û serok Mesûd Berzanî de çêbûn. Gelek hewldanên nîzîkatiyê di navbera Rojava û Başûr de çêbûn, nameya hevrêziyê û meşandina pêvajoyê ya Rêber Apo ji serok Mesûd Berzanî re hebû. Hemû hewldan nirxdar in û em wê bi erênî dinirxînin. Piştre Konferansa Yekhelwestiya Kurdî li Rojava çêbû, encameke baş bi dest xist vê konferansê. Lê çendîn gav hatibin avêtin jî dîsa li hemberî pêvajoya ku li herêmê tê meşandin lawaz in, ji ber em di qonaxeke metirsîdar û guhertinên bi lez re derbas dibin. Di heman demê de derfet jî li pêşiya gelê Kurd heye.”

**‘Kurd ne hevgirtî bin wê nikarbin destkeftiyên xwe biparêzin’**

Hevserokê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Ehmet Karamus diyar kir derfet li pêşiya Kurdan çêbûye, eger ne hevgirtî bin wê nikarbin destkeftiyên xwe biparêzin û wiha bi dawî kir: “Dewletên ku Kurdistan di nav xwe de parçe kirine, lawaz bûn di herêmê de, lê lawazbûna wan nayê wê wateyê ku ew ji me lawaztir in. Rewş çawa be jî dem hatiye û em dereng mane, divê partiyên Kurdî bi erk û misyona xwe rabin eger em erka xwe bi cih neyînin em ê li hemberî dîrokê bên şermezarkirin û rastî bobelateke mezin werin. Lewma jî pêwîst e her aliyek bi cidiyetekê û helwesteke niştîmanî nêzî mijara yekrêziya Kurdî bibe da ku em di warê siyasî, dîplomasî û parastina berjewendiyên niştîmanî em hevrêziya xwe roj berî roj pêk bînin. Eger derfet hat û rewşeke nû hat guhertin, Kurd ne yekhelwest û xwedî projeyeke niştîmanî bin, wê nikaribin parastina berjewendiyên xwe yên niştîmanî bikin. Îro pirsa Kurdî di saziyên navdewletî û cîhanî de bi rengekî baş hatiye diyarkirin, ev yek jî bi sedema xebata dîplomasî û têkiliya Kurdên diyasporê bi dezgehên navdewletî re ye. Ew hêzên ku xwedî istratîjiyeke hevbeş bin û yekrêziya wan hebe, hem jî diyalog di nabera wan de hebe, serkeftin hertim dibe şensê wan.”



# Sînorê Sûriyê -Tirkiyê bûye cihê işkenceyê

**Navenda Nûçeyan**

**Li gorî Rewangeha Mafê Mirovan a Sûriyê, ji destpêka salê û heta niha li ser sînorê Sûriyê-Tirkiyê 8 welatiyên Sûrî dema ku hewil didan derbasî Tirkiyê bibin ji aliyê leşkerên Tirk ve hatine kuştin, 25 jî birîndar bûne û bi dehan hatine işkencekirin.**

Di salên şer de, sînorê Sûriye-Tirkiyê bû cihê binpêkirinên tirsnak ku sivîl, di nav de jin û zarok, rastî awayên herî hovane yên tundûtûjiyê ji aliyê leşkerên Tirk ve hatin. Ev binpêkirin ji karanîna guleyên zindî û lêdanên giran bigire heya îşkenceya ku dibe sedema mirinê, diguherin.
Tevî hilweşîna rejîma Essed û guhertina hevsengiya hêzê li Sûriyeyê, trajediya Sûriyê bi şêweyên nû berdewam dike, sivîl bedela şer û valahiya ewlehiyê didin.
Li gorî Rewangeha Mafê Mirovan a Sûriyê hejmara kesên ku bi destê leşkerên Tirk ji destpêka sala 2025’an vir ve hatine kuştin gihîştiye 8 kesan û 25 kes jî birîndar bûne.

**Hûrgiliyên binpêkirinên li ser sînorê Sûriyê-Tirkiyê wiha ne:**

Di 13’ê Çileyê de leşkerên Tirk li ser sînor du welatiyên Sûrî işkence kirin, yek ji wan di bin îşkenceyê de mir û yê din jî bi giranî birîndar bû. Hat zanîn ku ew herdu wilatî ji Hemayê ne û li Reqa dijiyan, dema ku wan hewl didan di aliyê Kobanê re derbasî Tirkiyê bibin ji aliyê leşkerên Tirk yên li ser sînor hatin girtin.
Di 13’ê Çileyê de dema ku komeke Sûriyan hewl didan bi rêyên qaçaxçîtiyê ji gundewarên Serêkaniyê derbasî Tirkiyê bibin, ji aliyên leşkerên Tirk ve hatin girtin û işkence li wan hat kirin, di nava komî de jineke ducanî ji ber işkencê zaroka wê mir.
Di 19’ê Hezîranê de li bajarê Dirbêsiyê nêzîkî xeta sînor, ciwanek dema ku hildikşiya li ser banê mala xwe hildikişiya, ji aliyê leşkerên Tirk ve hat gulebarankirin û bi giranî birînar bû.
Di 28’ê Tîrmehê de zarokek ji bajarê Reqqayê dema ku hewl dida sînorê Sûriye-Tirkiyê li nêzîkî Kobanê derbas bike, ji aliyê leşkerên Tirk ve ve hate kuştin.
Di 27’ê Tebaxê de dema ku komek welatiyan hewil dan li nêzîkî gundê Keltabê yê rojhilatê bajarê Kobanê derbasî axa Tirkiyê bibin, ji aliyê leşkerên Tirk ve hatin gulebarandin û di encamê de welatiyek hat kuştin.
Di 10’ê Tebaxê de, ciwanek ji herêma Cebelê li gundewarê başûrê Helebê piştî girtina wî ji aliyê hêzên ewlehiya sînor ên Sûriyê ve li herêma Haremê rastî rêze îşkenceyan hat, li wir çend rojan rastî işkence û heqaretê hat.
Di 26’ê Tebaxê de, li bajarê Kobanê di encama gulebarana bêserûber a leşkerên Tirk hêzên zarokek bi giranî birîndar bû. Zarokê birîndar ji bo wergirtina lênihêrîna bijîşkî ya pêwîst ji nexweşxaneyên herêmê re hat veguhastin.
30’ê Tebaxê de komek welatî dema ku dixwestin ji aliyê Serêkaniyê derbasî Tirkiyê bibin ji aliyê leşkerên Tirk ve hatin gulebarandin û girtin, piştî girtinê jî hatin işkencekirin û di encamê de ji wê komê 4 welatiyan jiyana xwe ji dest dan.
Di 28’ê Îlonê de, sê kes dema ku hewl didan ji aliyê Serêkaniyê derbasî Tirkiyê bibin ji aliyê leşkerên Tirk ve hatin gulebarandin û birîndar bûn.
Di 5’ê Cotmehê de, leşkerên Tirk 6 ciwanên ku dixwestin di laiyê Girê Spî re derbasî Tirkiyê bibin, girtin û ew işkence kirin.
Di 25’ê Cotmehê de, li gundewarê rojhilatê Serêkaniyê, dema ku du ciwanan hewil didan derbasî Tirkiyê bibin ji aliyê leşkerên Tirk yên li ser sînor ve hatin gulebarankirin û di encamê de ciwanek hat kuştin û yek birîndar bû.



## Pêşketina Îsraîlê di Sûriyê de bi peyam e!

**Dilyar Cizîrî**

Di roja 28’ê Mijdarê de Artêşa Îsraîl bi bejahî derbasî gundê Beyt Cin a başûrê Şama paytext de pêş ket. Leşkerên Îsraîlî bendên kontorlê çêkirin, rêwî kontrol kir û di nava gund de bi hêsanî operasyona leşkerî pêk anî. Fermandarên Îsraîlê derbarê mijarê de agahî dan û diyar kirin, êrişa wan ji bo pêşîlêgirtina li dijî metirsiyên leşkerî û gefên li dijî ewlehiya wane. Balkêşe pê re rayedarên Îsralê ragihandin, danûstendinên di navbera wan û hikûmeta veguhêz a Sûriyê de têk çûye û tu encam pêkve ne hatiye.
Îsraîl bi vê yekê dixwaze şertên xwe bi hêza çekan li ser hikûmeta veguhêz a Ehmed El Şeri feriz bike. Bi taybet di demekê de hikûmeta behsa mijarê di hemû dosyayên xwe yên hindir û derve de xetimiye û nikare guhertinan pêk bîne.
Xwepêşandanên hefteya derbasbûyî ya li herêmê Elewiyan ku li ser banga Lêvegera Ruhî ya Meclisa Elewiyan Xezal Xezal nîşan dide hikûmeta veguhêz di qada hundirîn de bê bê çare bûye. Di heman demê de mijara danûstendinên di navbera wan û Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ji diyar dibe, danûstendin ber bi cemeda bi temamî ve diçe. Ji xwe mijara Siwêda ji herdû mijarên beriya xwe ne cûdatirin. Li herêmên Suniyan jî hikûmet nikare ji jiyana civakê re bibe bersiv. Hema nêzî salek di ser desthilata hikûmeta veguhêz re derbas dibe û heta niha nikarin gavan ber bi riya çareseriya demokratîk ve bavêje. Berûvajî wê hema xeta rêjîma berê ya Beşar El Esed girtiye û wê bi cilê xwe yê nû didomîne. Li gelek heêrmên Sûriyê perwede bi temamî sekniye.
Îsraîl guhertinên heyî ji nêz ve dişopîne. Dixwaze bi qezencên mezin derkeve. Li ser van mijaran zêde bike heta niha hikûmeta Ehemed El Şeri bi şêwayê xwe yê heyî zemînek baş ji çeteyên DAIŞ’ê û teroristên din re vekiriye. Her çendî hikûmeta veguhêz bi Amerîka re itîfaq kiriye û qaşo tevî Koalîsyona li dijî DAIŞ’ê bûye. Lê ev nayê wê wateyê metirsiyên wan li ser ewlehiya herêmê nemaye. Berûvajî wê DAIŞ’ê ji Artêşa heyî ya hikûmeta veughêz sûdê werdigre û tevgera xwe bi wan konfilaş dike.
Di êrişa wan a li eniya Medan a li ser bendên QSD’ê bi belge ev diyar bû. Dîmenên balafirên wan ên bê mirov ên ketin destê QSD’ê de hevkariya wan radixe ber çavan. Lê zêde bike tevgera çeteyên DAIŞ’ê ya li Dêrazorê û başûrê Sûriyê vê rastiyê hîn bi hêztir dike. ji lewma Îsraîl di vê mijarê de dixwaze rewşa heyî bikar bîne. Şertên xwe di peymana aştî de bi cih bîne. Li şûna peymanên ewlehiyê yên demkî aştiya meyînde bêyî dayîna Colana û beşek mezin ji herêmên nû dagirkiriye, li hikûmeta Sûriyê vegerîne.
Hikûmeta veguhêz a Sûriyê jî bi rewşa xwe ya heyî diyar dibe, nikare xwe ji bin sîwana dewleta Tirk û hin hêzên ereb derbixe.
Ji lewma jî nikare tu pirsgirêkên behsa mijarê çareser bike. Ev jî rê ji Îsraîl û beriya wê dewleta Tirk re vedike li gorî hêza xwe siyasetên xwe di Sûriyê de feriz bikin.



# Di mîtolojiya û ol de civak

Mîtolojî şaxek ji zanistên mirovî ye ku şîrovekirina efsane û çîrokên gelêrî yên li ser xwedayan, qehremanan û bûyerên serxwezayî di çandên cûda de lêkolîn dike, bi armanca têgihîştina bawerî, nirx û têgihîştina mirovan a li ser gerdûn, jiyan û mirinê. Herwiha di dîn de jî parçebûn heye, civak jî bi rêya koleyê ve tê rêvebirin.

**Navenda Nûçeyan**

**Pênasekirina Mîtolojî**

Ev zanist çavkanî û pêşveçûna efsaneyan û rola wan di şekildana nasnameya çandî û civakî ya gelan de dişopîne û li ser nivîsên kevnar, belgeyên devkî û huneran hatiye avakirin. Di heman demê de mîtolojî berhevokek ji efsaneyên taybetî yên çandek an folklora taybetî ye ku alîgirên wê bawer dikin ku pir rast in û ravekirinên tiştên ku di xwezayê de diqewimin. Herwiha tiştên ku bi mirovahiyê ve girêdayî ne dihewînin. Ji hêla din ve, mît çîrokek e ku ji berhevokek bûyerên serxwezayî û ecêb pêk tê. Ew dikare berhevokek ji bûyerên dîrokî yên ku di bîra mirovan de hatine vegotin, lê bi awayekî cûda çîrokê diguherîne an lê zêde dike, dihewîne.
Peyva “mîtolojî” di bingehê xwe de Yewnanî ye û tê wateya efsane an çîrokên kevnar.

**Pêkhateyên mîtolojiyê**

Mîtolojî: Ji bo fêmkirina sembol, bawerî û qalibên dubare di hişmendiya kolektîf de, dikeve nav analîza mîtan.
Têgihîştina Diyardeyan: Armanc dike ku rave bike ka mirov çawa li gerdûnê, afirandinê û jiyana piştî mirinê dinêrin.
Analîza çandî û civakî: mîtan bi çarçoveyên çandî, civakî û olî ve girêdide û rola wan di rewakirina norm, adet û rêûresman de eşkere dike.

**Karên Mîtolojî**

Bersiva pirsên mezin: Mîtolojî bersiva pirsên hebûnî yên wekî “Kê cîhan afirand?”, “Dewlet dê çawa biqede?” û “Piştî mirinê çarenûsa mirovan çi ye?” didin.
Rewakirina sîstemên civakî: Ew alîkariya rewakirina hebûna pergalek civakî ya taybetî an norm û kevneşopiyên ku di civakekê de belav dibin, dikin.

**Qadên Lêkolînê di Mîtolojiyê de**

Efsaneyên afirandinê: çîrokên ku rave dikin ka gerdûn çawa derketiye holê û jiyan çawa dest pê kiriye.
Efsaneyên bidawîbûna cîhanê: Çîrokên li ser çarenûs û vejîna cîhanê.
Efsaneyên qehremanî: çîrokên qehremanên mezin ên xwedî hêzên serxwezayî.
Mîtolojiya Elmûqarene: Li gorî zanyarê Elinserobolociya Kilûd Lîvî Şitrawis avahiyên bingehîn ên hevpar ên mîtên cûda lêkolîn dike û mûqrene dike.

**Taybetmendiyên Mîtolojiyê**

Ew bi kûrahiya xwe ya felsefî tê cudakirin ku wê ji çîrokên din ên gelêrî cuda dike.



Berê mîtolojî, mîna zanistên din, wekî tiştekî ku di naveroka xwe de tê qebûlkirin û pejirandin dihat hesibandin.

Gelek caran, efsane li dora xwedayan an nîvxwedayan, xwezaya hebûna mirovan û rola mirovan di van efsaneyan de dizîvîrin.

Ew diyardeyên xwezayî, çawaniya çêbûna gerdûn, çawaniya afirandina mirovan û gelek mijarên din ên bi zanistên mirovî ve girêdayî vedibêje û rave dike.

**Cureyên Mîtolojiyê**

Mîta rêûrismî.
Mîta afirandinê.
Mîta şirovekirinê.
Mîta sembolîk.

**Rola mîtolojî di civakê de**

Şîrovekirina hebûn û gerdûnê: Mît ji bo pirsên bingehîn ên mirovan ên wekî çavkaniya gerdûnê, xwezaya mirov û wateya jiyan û mirinê ravekirinan peyda dikin.
Rênîşandan rêbazên civakî: Mît civakê ber bi norm û nirxên exlaqî ve dibin, xeta cudaker a di navbera rast û xelet de zelal dikin û beşdarî şekildana rêbazên takekesan û koman dibin.
Şekildana nasnameya kolektîf: Mît çîrokên qehreman û kokên hevpar peyda dikin, hesta aîdiyetê pêş dixin û dibin alîkar ku nasnameyeke komê ya yekgirtî û cihêreng ava bikin.
Îfadekirin çand û baweriyan: Mît nêrîna cîhanê û baweriyên olî û felsefî yên mirovan nîşan didin û beşek girîng a mîrata wan a çandî pêk tînin ku ji nifşekî ber bi nifşekî din ve tê veguhestin.

Bersivdayîna diyardeyên xwezayî û civakî: Mît bi şirovekirin û wateyê dayîna diyardeyên fîzîkî yên wekî lehiyê û diyardeyên civakî yên wekî qanûnan bersiv didin, bi vî awayî hesta bêçaretî an jî matmayîbûnê di nav endamên civakê de kêm dikin.

**Bi huner û çandê re têkilî**

Çîrokên mîtolojî, destan, helbest û edebiyata nivîsî têne bikaranîn. Ev mitolojî ne tenê beşek ji dîrokê ye, lê beşek ji çanda rojane ye.

Têgihiştina Tevgera Mirovî: Mijarên wekî şewqên xwedan, qurbaniyên şehîdan û xiyanetên wan, alîkariya têgihiştina tevgera mirovî dikin. Ji vê aliyê, mîtolojî dikare ronahiyek bidê bo zanistên wekî psikolojî û sosyolojî.

**Mîtoloji û Jin**

Mitolojî çavkaniyeke kevnar e ku di çanda mirovî de rûmeta jinê bi awayekî zêde girîng nîşan dide. Di çendiyên kevnar de, jin wekî xweda, dayik an jî şêwirmend tê xuyakir. Lê di hin mîtolojiyên din de jin bi awayekî kêmtir, zêde xizmetkar an jî sedemê xwîn û şer tê nîşandan. Di mîtolojiyên Mezopotamyayê de, jinên wekî Înanna û Eştar xwedan hêz û xwêzî ne. Di mîtolojiyên Yewnanî de, jinên wekî Athena, Hera û Aphrodite rolên girîng ên siyasî, şehrazî û hevpeyvînî digirin. Di mîtolojiyên Kurdî de jî, jin bi awayekî xweş û xwêzî tê xuyakir, wekî dayikê zemanê, parêzvanê axê û hêza xwezayê ye. Mîtolojî dikare beşek ji şopandina rol û rûmeta jinê di civak û dîrok de be. Di vê çarçoveyê de, jin ne tenê beşdarê çîrok û afsaneyan e, lê çavkaniyeke girîng e ji bo têgihîştinê ku civak çawa jinê dîtibû.

**Li gorî lêkolînên Mîtolojîk rola mêr**

Di parastinê de rola mêr: Mêr bi nasnameya gundî û şerkerî klanê ji têhdîdan derve diparêze. Hêza fizîkî û stratejî taybetmendiyên wê ne. Mêr wekî yek beşê tevahiya jinê tê dîtin. Ew figûrek e ku ji hêla jinê tê zayîn, mezin dibe û rê tê dayîn.

**Rolên cuda, nirxa wekhev**

Di mîtolojiyê de jin û mêr rolên cuda digirin, lê yek ji yê din zêde nîne. Ev têkiliyeke wekhev e ku bi têgihîştina aştiyê ya nûjen re, têk dike.

**Bêsinîfî**

Di civakên mîtolojîk de hiyerarşî tune, belkî parvekirina karan heye. Her kes jiyanek heye, nirx heye û beşek ji tevahiyê ye ku her tişt jiyanek heye.

**Bandora animîzmê**

Di mîtolojiyê de, çiya, dar, çem, av û hêşî jî jiyanek tê hesibandin. Ev têgihiştin jiyaneke bi xwezayê re têkildar nîşan dide. Di nav civak, xweza û mirovan de sinor nîne. Girêdanên avahî hene. Her tişt bi hev re diaxive, di têkiliyê de ye.

**Mîtolojiyên Sumerî**

Sumeriyan mirovan wekî xizmetkarên xwedan çêkirin. Xwedan Enkî û Ninmah mirovan bi tevgera ax û xwînê xwedan çêkirin. Armanc ew bû ku karê xwedan hêsan bibe.

**Mîtolojiyê Yewnanî**

Prometheus ji xwedan agirê dikuje û mirovan dide, ji ber vê yekê cezayê dide.
Mirov di demsalên cuda de hate afirandin: Demsalê Zivistanê, Zilverê, Bronzê, Qehreman û Demsalê Demirê. Mirovên Demsalê Zivistanê wek xwedan dijiyan, êş û xem nedîtin. Bi demekê mirovan dest bi şerê xwedan kirin û cezayê wergirtin.

**Mîtolojiyê Babilî**

Xwedê Marduk Tiamatê xwedê kaosê dikuje û ji laşê wê dinyayê çêdike. Wekaki Çiçek dimire ji çiçeke şev çedibe. Tiştek ji bo çebibe, pêwîst e tiştek bimire, ji bo dûnya çebibe pêwîst e tûamat bimire. Mirovan ji bo xizmeta xwedan çêdikin; di çêkirina mirovan de ax û xwînê xwedan tê bikaranîn. Bi gelemperî xwedê afirandinê Ûlgen an jî Kayra Han vê pêvajoyê rêve dike.

**Heza jin gava dikeve dest zilam**

Di çêbûna mirov de, Hewa dibe pisrgirek û gunehbar. Di vê dîtinê de, jin dikeve xizmeta zilam. Ev dibe bingehê perçebûna navbera jin û zilam de. Jiyana şaş rast nabe jiyankirin. Şaştiya destpêkê dibe bingehê perçebûna destpêkê. Di mîtolojiyê de, bi destê zilam jiyan tê çêkirin. Ev çîrok di dîn de jî dibe bingehê jiyana civakî û perçebûnê. Ev çîrok ji Sumeriyan derbasî hemû şaristanan bûye. Di mîtolojiyê de, serdestiya civakê bi zîhniyeta şaş tê avakirin û jiyana mirovî tê şaşkirin. Lê pêwîst e ku neyê jibîrkirin ku di mîtolojiyê û civakê de, afirandina jine jî heye.

**Mîta di serdema nûjen de**

Tevî pêşketina zanistê jî, efsane hîn jî bandorek mezin li ser şekildana hişmendiya civakan dikin û di wêje, huner û medyayê de xuya dibin.

**Di ol de civak**

Mîtolojiyên Sumerî rêbazên îdeolojîk ên qewimandina ruhan in. Zanînên wan ji bo qewimandina îdeolojîk û çêkirina xeyal û şaşî di nav mirov de têne bikaranîn. Ev mîtolojî derdikeve cihê cudakirina hêz û koçer, jin û mêr, ruh û beden, zêrekîya hisî û zêrekîya analîtîk.
Bi mîtolojîyê mirov dibe qeşeya xwedê, jin jî dibe tiştê ku ji parsûwê mêr hate afirandin. Şoreş û dijşoreş jî bi mentalîteyê têne kirin. Bi Sumer û mitolojî re felsefeya koçerî tê pêşxistin. Ev sîstem wekî qeder hate serxistin. Lê hene ku ew qeder qebûl kirin, hene jî qebûl nekirin û hêzên ku berê xistin, yek ji van hêzan jin in ku hêza bingehîn a pergalê ya matriarkî ne û jî komên, aşîretên ku xwestin wan bifikirin. Van hêz di çiya, çolê û daristanê de berê xistin. Duyem hêza berê xistin di formê olên xwedêyekê de xuya dibe. Ew li dijî çandê ya padîşah-xwedê ye. Dîyar dike ku mirov nikare xwedê be û xwedê yek e. Bi Hezret Îbrahîmê di serdema M.Î. 1700’an de pêk tê. Îbrahîm bi şikandina pîran guherîna mentalîyetê pêşve dike û pergala koletiyê ya qelew nerm û reform dike.

**Gava ku mîtolojî bi dogma diguherin, dîn diafirîne**

Mîtolojî nikare bi temamî wekî ol were hesibandin. Ol pêdivî ye ku bawerî û şêwazên ibadetê negerîn bibin. Ew bi temamî çêbûyî ye. Bawerîkirinê li ser çêbûyî bingehê olê ye.
Tenê taybetmendiya pozîtîf a wê ew e ku di guherîna fikrê kurasiyekê di civakê de giran çêdike û bi awayekî ne xwestî jî, rêyek bo fikrê zanistî û felsefî vedihewîne. Dî nezikatiye din de her tişt li gorî gotina xwedê ye , jiyan, armanca û rêya gihîştina rastiyê bi gotina Xwedê ya ji civak û xwezayê derbas dibe. Hemû pêximber li dijî hêkimtiyê rabûn, berxwedan kirin û heta mirinê çûne. Lê di encamê dexulamiyê bi hêz kirin.